Hawar
Rojnameya Rojane
11 Gulan 2009 Duşem
Sal: 1
Hejmar: 6
Buha: 50 Kr

## Roja Dayikan ji bo wan rojeke reş bû



Roja Dayikan li herêmê bi awayek xemgînî bi daxuyanî, meş û çalakiyên cihê hate pîroz kirin. Dayikên bal kişandin ser pevçûnên li Tirkiyeyê û xwestin ku riya aştiyane ya pirsgirêka kurd bê vekirin... *RÛPEL - 7*

# 'Fermana komkujiyê ustegmen Şenturk da'

Beriya hilbijartinên 29'ê Adarê çapemeniya Fethullah Gulen bi nûçeyên derew xwest komkujiya Koşuyoluyê bixin stûyê PKK'ê. Ligel ku bersûcê komkujiyê Hikmet Topal li xwe mikur hatibû û gotibû fermana êrîşê usteg-men Ahmet Şenturk daye dîsa jî çapemeniya tirk bi nûçeyên derew dixwest rastiyê ji raya giştî veşêre. Topal di îfadeya xwe de plansaziya Qetlîama Koşuyoluyê kite bi kite vegot. Îfadeyên Topal xwîna mirovan disekinîne



### HÎKMET TOPAL LI XWE MIKUR HAT

Dewleta Tirk di kirinên xwe yê nepenî de her tim ketiye nava hewldanan ku bûyerê bixe stûyê PKK'ê. Ji ber vê di kirinên xwe de hewl daye ku şahida li dû xwe nehêle. Dema şahidên bûyerê rastiyê vebêjin jî çapemeniya tirk weke qelemşorên şerê taybet hewl didin ku rastiyê berevajî bikin. Di komkujiya Koşuyoluyê de bersûc Hikmet Topal li xwe mikur û got; 'fermana êrîşê ji aliyê ustegmen Ahmet Şenturk ve hatiye dayîn.'

### JI BO TEQÎNÊ JI LEŞKERIYÊ HATIYE AMEDÊ

Hikmet Topal di îfadeya xwe de diyar dike ku dema li leşkeriyê ye di encama guftûgoyên bi ustegmen Ahmet Şenturk re bi dildarî xwestiye hevkariyê bike. Topal, dema leşkeriyê ye li ser lihevkirina bi ustegmen Ahmet Şenturk re hatiye Amedê. Li Amedê bi astsûbayê li navê Sedat re amadekariya çalakiyê kirine. Topal, di îfadeya xwe de gotiye ku li gorî fermanên Sedat astsûbay tevgeriyaye... *RÛPEL - 3*

### Çapemeniya tirk îfadeyên Topal berevajî kirin

Çapemeniya tirk bi agahiyên derew îfadeyên Hikmet Topal berojavî kiribûn û ragihandibûn. Di pêvajoya ku operasyon li hemberî DTP'ê pêk hatî de di serî de Koma Medyayê ya Dogan, rojname û televîzyonên Fetullah Gulen ên nêzî Hikûmeta AKP'ê her wekî Hîkmet Topal li ser navê PKK'ê ev êrîş pêk anî nîşan dabû. Di çapemeniya tirk de dîmenên Hîkmet Topal ên ku dihate îdiakirin li geştê kişandine nîşan didan û berovajî îfadeyên wî yên ku dabûn îdiayên ji bo reşkirina tevgere azadiyê pêşkêş kiribûn.

### Komkujiya bi usûla Ergenekonê

Li Mêrdînê komkujiyekê rû da ku di encamê de li gel jin û zarokan 44 kesan jiyana xwe ji dest dan. Bila kes matmayî nemîne! Wêneyê derkeve pêşiya me, bi temamî wêneyekî Ergenekonê ye. Dîsa di sala 2006'an de, hewl dan komkujiya li Koşûyolû ya li Amedê bavêjin stûyê PKK'ê... *Nivîsa Cuma RONAHÎ - R.2*

## Ji bo Enes Ata bafirok firandin



Şaxa Egîtîm Sen'ê ya Amedê di çarçoveya Şahiya Firandina Bafirokan a Enes Ata de ku di bûyerên 28'ê Adarê 2006'an li Amedê pêk hatin de ji hêla polîsan ve hatibû kuştin de şahî li dar xist. Di şahiya li Çiyayê Kirklarê pêk hatî de 350 zarok bi mamosteyên xwe re beşdar bûn. Zarokan bafirokên bi alîkariya mamosteyên xwe çêkirin, firandin. Piştre li ber dahol û zirneyê zarokan govend girêdan û stran gotin.

## Li hemberî gelan durûtiya Sûriyeyê

**REJÎMA** Sûriyeyê ji bo kurdan di her qada jiyanê de qedexeyan cih dike lê ji bo tirkmenan dibistanên tirkî vedike û di asta wezaretê de peywirdar dike. Li gorî daneyên ne fermî li derdora Halebê nêzî 50 hezar tirkmen dijîn. Li gorî lêkolînan Navenda Lêkolînên Stratejîk a Kurdistanê di encama hewldanên Tirkiyeyê deji bo tirkmenan dibistanên tirkî hat vekirin û dest bi perwerdeyê kir. Heta ji tirkmana wezîr jî hatin peywirdarkirin...

## Bombebarana li Başûr diçe NY'ê

**LI HEMBERÎ** bombebarana artêşên Tirkiye û Îranê ya Herêma Federal a Kurdistanê bertek zêde dibin. Piştî Tirkiyeyê Îranê jî ji bilî avêtina topan li hemberî herêmê êrîşa hewayî pêk anî û ev yek di parlamentoya Iraqê de bû sedema nerazîbûnan. Nezî 70 parlamenteran der barê mijarê de daxuyaniyek da û bûyer şermezarkirin. Welatên Yekbûyî yên Ereban cara yekem êrîşên Îranê şermezar kir û xwestibûn ku êrîş demildest rawestin... *RÛPEL - 4*

## Herêma Kurdistanê dê petrolê îxrac bike

Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê diyar kir ku ew ê ji meha hezîranê pêve dest bi îxrackirina petrolê bikin. Wezîrê Çavkaniyên Xwezayî yê Herêma Kurdistanê Aştî Hewramî di destpê de ji bîra petrolê ya Tawkê ya li nêzî Zaxoyê 60 ton varîlên petrolê yên hatine derxistin îxrac bikin... *RÛPEL - 4*

## Grevên birçîbûnê yên DTP'ê didomin

Grevên birçîbûnê yên bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser DTP'ê hatine destpêkirin berdewam dikin. Li Pirsûsa Rihayê ji bo 2 rojan greva birçîbûnê hate destpêkirin û li Êlih û Naeçeya Silopiya Şirnexê jî grev bi girseyî didomin. Di greva Qoserê de Ahmet Turk bal kişand ser gotinên serokomar Abdullah Gul... *RÛPEL - 4*


## Pirsgirêka kurd bi gotinekê nayê çareserkirin

Pirsgirêka kurd bi daxuyanî an jî gotinekê nayê çareserkirin. Ev rastiyeke û derketiye holê ku bi dehan salan e ev mijar bi şer, tundî û înkarê nayê çareserkirin. AKP jî baş dizane ku mijara herî sereke ya ku hikûmetên berî wê tunekirin, bêçareserkirina pirsgirêka kurd de, lewra jî dem hatiye ku ji bilî tundiyê çareseriyeke din bê dîtin... *Nivîsa R. Xerzî R.5*



## Şanoger Selamo krîza dil derbas kir

Şanoger û stand-upvan Selamo pêr bi şev saet 23:00'an de li mala xwe ya bajarê Solingen ê Almanyayê ji nişka ve nexweş ketiye û ew rakirine nexweşxaneya Stadt Klînik a Zolîngenê. Piştî mudaxaleya hate kirin doktoran ragihandin ku şanogerê kurd krîza dil derbas kiriye û rewşa xeter hatiye derbaskirin. Selamo niha li nexweşxanê ye.



## Resimên masûmiyet û bêedaletiyê

Resimên orjînal ên helbestkarê îngilîz ê navdar, resam û vîzyonerê mîstîk William Blake piştî du sedsalan li Londonê bi pêşangeheke ku ji gel re vekirî ji bo hunerhezan hate pêşandan. Blake, di jiyana xwe ya hunerî de di warê resim û edebiyatê de dûrî hunermendên elît sekiniye û di nava tevgerên şoreşger ên wê demê de cih girtiye... *RÛPEL - 6*



## Xelatên Zarakolu hatin belavkirin

Xelatên Azadiya Ramanê bi merasîmekê li Şaxa ÎHD'ê ya Stenbolê hate dayîn. Merasîm bi sînevîzyona ku behsa jiyana Ayşenur Zarakolu dike hate vekirin. Axaftina vekirinê ji aliyê Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Stenbolê Gulseren Yolerî hate kirin. Xelatên Azadiya Ramanê ya Ayşenûr Zarakolu layiqî Mahmut Alinak, Fusûn Erdogan û Temel Demîrer hate dîtin... *RÛPEL - 6*

CUMA RONAHÎ

# Komkujiya bi usûlê Ergenekonê

Li Mêrdînê komkujiyekê rû da ku di encamê de ligel jin û zarokan 44 kesan jiyana xwe ji dest da. Gava mirov vê komkujiyê dinirxînin, hingî wêneyekî berê me dîtibû derdikeve pêşiya çavên me. Bila kes matmayî nemîne! Wêneyê derkeve pêşiya me, bi temamî wêneyekî Ergenekonê ye. Gelo çima?

Divê şaş neyê fêmkirin ku bi nîşandana gunehkariyê re em dixwazin hemû bûyerên li welatê me diqewimin bavêjin stûyê Ergenekonê. Berovajî, nîşaneyên gelekî xurt li holê heye ku me ber bi nirxandineke bi vî rengî ve dibe. Her guhdar an jî temaşerevanên hestiyar ên navgînên çapemeniyê dişopînin kêm-zêde di haya karên qirêj ên vê organîzasyonê de ne.

Di destpêka hemû karên qirêj û gemarî yên Ergenekonê de pîvanek heye. Ew pîvana Ergenekonê jî pîvana 'Divê li paş şahid neyê hiştin' e. Bi vê têgihiştinê, di gelek karên xwe yên qirêj de ji bo şahidan nehêlin, delîl û şahid ji holê rakirine. Di ser de gelek kadro û piyonên di karên xwe yên gemarî de bi kar anîne, qetil kirine. Gelek mînakên vê hene. A. Cem Ersever jî yek ji van mînakan e. A. Cem Ersever yek ji damezrînerên JÎTEM'ê ye. Gelê me baş dizane ka JÎTEM çi ye û çi kiriye. Kesekî bi vî rengî jî, ji aliyê kesên ew bi kar aniye ve hatiye kuştin. Rojnivîsên A. Cem Ersever û çeka wî bi kar anî ligel bersûcên Ergenekonê derketin holê û ev rewş jî vê yekê piştrast dike. Di roja îro de derket holê ku gelek kesên mîna A. Cem Ersever ji aliyê Ergenekonê ve hatine kuştin.

Ya li vê derê derketiye holê, rê û rêbazên pêkanîna komkujî û kuştinên bi usûlê Ergenekonê ye. Ergenekon, gava karên xwe yên qirêj dike bi têgihîştina 'eger li dû şahid neyê hiştin, hingî kiryarên kar jî wê ne diyar bin' tevdigere. Komkujiya li Mêrdînê jî bi vê têgihîştin û mejiyî hatiye kirin. Ji bo li dû tu şahidan nehêlin, çi zarok be çi jin be xwestin hemû kesên li wê derê bikujin.

Hin kesên ku ji vê bûyerê bi birîndarî filitîn, ev lîstika wan xira kirin. Li dû bûyerê şahid man. Eger tiştekî wiha nebûya û her kes bimira, aşkera bû ku wê berpirsyariya vê bûyerê bavêtanya stûyê PKK'ê, herî kêm dê şik û gumanên bi vî rengî biafirandana. Di demên bihurî de ev yek hat kirin. Komkujiyên berî niha li dijî cerdevan û xizmên wan hatin kirin, xwestin malî PKK'ê bikin. Dîsa di sala 2006'an de, tevî ku kiryarên wê diyar bûn û berpirsyariya wê hilgirtibûn ser milê xwe jî, hewl dan komkujiya li Koşûyolûya li Amedê bavêjin stûyê PKK'ê. Ev yek jî, beriya hilbijartinên herêmî yên 29'ê Adarê ji aliyê çapemeniya Fetûllahî ya alîgirê AKP'ê ve hate kirin. Tevî ku îfadeyên yek ji kiryarên komkujiya Koşûyolûyê Astsûbay Hîkmet Topal ên ligel polîsan tê zanîn jî, ev yek hat kirin. Têgihîştineke ku bûyereke ew çend zelal û aşkera malî PKK'ê dike, aşkera ye ku wê komkujiya li Mêrdînê yekser malî PKK'ê bikira. Ji ber ku gundê lê komkujî hat kirin cerdevan bû û gundê berî her kesî li wê herêmê cerdevanî qebûl kiriye, vê rewşê hîn bêtir derfet dida propagandayeke reşkirinê. Mayîna şahidan a li dû komkujiyê, pêşî li propagandayeke reşkirinê girtiye.


Hin daneyên din hene, ku nîşan didin komkujiya li Mêrdînê bi usûlê Ergenekonê ye. Xwediyê rastîn ê gundê lê komkujî hat kirin gelê Asûrî-Suryanî ye. Gelê Asûrî-Suryanî di encama zextên dewlet-mêtingeriyê de gundê xwe terikandiye. Di heman pêvajoyê de, bi hezaran gund bi vî rengî hatin valakirin. Gundên hatin valakirin jî ji aliyê dewletê ve ji cerdevanan re hatin dayîn. Jixwe pişt re derket holî ku ev gundên mijara gotinê çawa ji aliyê Ergenekonê ve hatine bikaranîn. Di nîqaşên li ser doza Ergenekonê de tên gotin, ku ji bo çareserkirina krîza aboriyê ya salên 1993'an û 1994'an, hikûmeta wê demê karê qeçaxçitiya narkotîkê kiriye û xwestiye bi vî rengî pêşî li krîzê bigire. Ev rastiyeke tê zanîn e. Çapemeniya azad-alternatîf gelek caran ev rastî anî ziman. Lewma ev navgînên çapemeniyê ji aliyê dewletê ve hatin cezakirin.

Piştî ku komkujî hat kirin gotûbêjan destpê kir, ku li gundê lê komkujî rû daye, Haşhaş dihat çandin û li ser parvekirina hatineyê ji vê narkotîkê, dijminahiyê rû daye. Hebûna qereqolê ya du kilometre nêzî gund jî nîşan dide, ka çandina haşhaşê û trafîka narkotîkê çawa tê rêvebirin û rola JÎTEM'ê ku li Kurdistanê Ergenekonê temsîl dike, bi çi rengî ye.

Her wiha divê neyê jibîrkirin; hêza ku cerdevanan li Kurdistanê ji bo şerê qirêj û taybet bi rêxistin dike û li gorî wê perwerde û amade dike, Ergenekon bi xwe ye. Cerdevanan jî, bi vê perwerdeya stendiye û çekên ji wan re hatiye dayîn, ev komkujî kirine. Ev hemû rastî nîşan didin, ku komkujiya li Mêrdînê rû daye, bi usûla Ergenekonê ye. Lewma, berpirsyarê vê komkujiyê şerê taybet-qirêj e û hêzên vê yekê li welatê me bicih tîne û Ergenekon e. Divê ev rastî bi tu awayî neyê berovajîkirin.

Ev komkujî pêwendiya xwe bi tu awayî bi kevneşopî û toreyê kurdan re nîne. Di kevneşopî û toreyên kurdan de kuştina jin û zarokan tuneye. Ev komkujî, ji ber kevneşopî û toreyên kurdan rû nedaye. Bi temamî ji ber berjewendiyên qirêj pêk hatiye. Di şert û mercên rewşeke nû ya civakî ya kurd de ku Têkoşîna Azadî û Demokrasiyê afirandiye, kurd bi tu awayî rê nade hovîtiyeke bi vî rengî. Li welatê me, ku dozên xwînî yên sedan salan çareser dibe, gelê me destûrê nade vê yekê.

Komkujiyên bi vî rengî, mîna ku li Mêrdînê hat dîtin bi tenê dikare lîstika şerê qirêj-taybet rû bide. Li dervehiştina Parlamenterên DTP'yî yên ji bo lêkolînkirina komkujiya li Mêrdînê avakirina komîsyonekê pêşniyar kiribûn, bersivdayîna bi girtin, operasyon û provokasyonanan a li gavên ji bo çareseriya demokratîk û aştiyane û rûdana vê komkujiyê, vê nirxandinê piştrast dike.





## Ji ber berjewendiyên qirêj komkujî pêk hatiye

**Di encama komkujiya li Mêrdînê de ligel jin û zarokan 44 kesan jiyana xwe ji dest da. Gava mirov li vê komkujiyê dinêre, hingî wêneyekî berê me dîtibû derdikeve pêşiya çavên me. Bila kes matmayî nemîne! Wêneyê derkeve pêşiya me, bi temamî wêneyekî Ergenekonê ye... Ev komkujî pêwendiya xwe bi tu awayî bi kevneşopî û toreyê kurdan re nîn e. Di kevneşopî û toreyên kurdan de kuştina jin û zarokan tune ye. Ev komkujî, ji ber kevneşopî û toreyên kurdan rû nedaye. Bi temamî ji ber berjewendiyên qirêj pêk hatiye.**



Bizmar

Adil Zozanî
a_zozani@hotmail.com

## Dê Alayên Hemîdiyan modernîze bikin

Di demên krîtîk de ji bo ku mirov nexşeriya xwe şaş neke divê mirov li paşerojê binêre. Piştî bûyere Zankirtê pirsgirêka cerdevaniyê hate rojevê. Siyaseta kurd ligel piraniya saziyên sivîl ên demokratîk ji roja hatiye avakirin heta niha li dijî pergala cerdevaniyê ne.

Heta îro ji bo ku ev pergal bê bidawîkirin bi sedan rapor hatine amadekirin. Di gelek konferansan de daxwaza ji bo rakirina vê pergalê hatiye ziman. Bi taybetî ji bo me kurdan, hebûna pergala cerdevaniyê tim wekî rûreşî hate navkirin û wisa ye jî... Aşkeraye ku ev pergala cerdevaniyê ji bo me kurdan pergala îxanetê ye. Îxanetkirina li qewmê xwe ye. Ji sala 1985'ê heta îro ev pergala îxanetê di nava me de bi cih bûye. Rih û rîçikên xwe yên xiyanetê wekî daralînkê li Kurdistanê rikubandine.

Ji sala 1985'ê heta 2002'ê –heta serdema AKP'ê- ligel ku di hin deman de hejmar guheriye; bi tevahiya Kurdistanê nêzî 60 hezar cerdevanan hebûn. Di serdema AKP'ê de ev hejmar hate zêdekirin û armanca Hikûmeta AKP'ê ew e ku hejmara cerdevanan bigihijîne 100 hezarî.

Erê gelo, neyaran ev pergala xiyanetê çawa di nava me kurdan de bi cih kir? Divê em li dîroka xwe binêrin. Piştî serhildana Şêx Ubeydulahê Nehrî (1884) hate têkbirin, Alayên Hemîdiyan hatin sazkirin. Muşir Zekî Paşa yek ji fermandarên osmanî yên ku bêbextî li Şêx Ubeydilah kiriye bû.

Bi propagandaya 'bila hê jî zêdetir misilman hev nekujin' Şêx Ubeydilah ji bo hevdîtinê hatibû îknakirin û piştre hatibû surgunkirin. Di heman serdemê de hêza azadîxwaz a ermeniyan jî gur bûbû. Di 13'ê hezîrana 1878'an de li Berlînê 'Projeya li ser Ermenistanê' hatibû qebûlkirin.

Li ser pêşniyara Muşîr Zekî Paşa, Siltan Abdulhamîd fermana ji bo avakarina Alayên Hemîdiyan di sala 1891'ê de îmze kir. Du armancên sereke yên van alayan hebûn: Yek, rê li ber azadîxwaziya ji bo Kurdistanê. Du; qirkirina ermeniyan.

Osmaniyan bi riya van alayan, hem eşîretên kurd ên ligel Şêx Ubeyilah ji bo azadiya welatê xwe têkoşîn dayîn çewsandin, hem jî ew eşîr daxilî pergala xiyanetê kirin. Osmaniyan bi destê van alayan komkujiya ermeniyan pêk anî. Piştî 118 salan, îro wêrisên osmaniyan qalmecal bûne ku vê komkujiyê qebûl bikin. Di navbera Tirkiye û Ermenistanê de dê komîsyonên dîrokî bêne sazkirin. Ev komîsyon dê komkujiya ermeniyan vekolin. Di encama vê vekolonê de rastiya komkujiyê dê derbikeve holê. Bersiva dewleta tirk ji îro ve diyar e. Dê bêjin: Me wê demê çek dabûn destê 'kurdên cahîl' û wan jî ev karesata dîrokî pêk anî.

Ev aliyek. Li aliyê din Alayên Hemîdiyan tuxmê xiyanê di nava me kurdan de çand. Parvekerên Kurdistanê li çar parçeyan ev pergal li hemberî me kurdan bi kar aniye. Li Îran û Tirkiyeyê pergal îro jî didome. Heta îro me nekarê vê xiyanetê ji nava xwe derbixin. Ligel qetlîama li Zankirtê pêk hatî ji bo dawî lênanîna vê pergalê fersendek ketiye destê me. Lê dewleta tirk jî dixwaze ji rewşa heyî encameke li gorî xwe derbixe.

Revîzekirina pergala cerdevaniyê ev du sal in di rojeva Tirkiyeyê de ye. Di serî de Serfermandarê wê demê Yaşar Buyukanit û gelek rayaderên dewletê yên têkildarî hêzên paramilîter aniye ziman ku divê ev pergal bê revîzekirin. Revîzyona ku difikirin ev e: Cerdevanên ku heta niha bitêkildariya sûc deşîfre bûne dê bêne tasfiyekirin. Li cihê wan kesên ciwan bêne girtin û wekî hêzeke taybet a xweser bikişînin qişleyê. Ango armanca wan ew e ku Alayên Hemîdiyan bi awayekî modernîzekirî ji nû ve ava bikin. Lê armanc eynî ye. Dê vê carê pirtir kurdan qetilbikin û piştî demekê bêjin: Me kurd qetil nekirin. Kurdan hev du qetilkirine.



Feraşîn

Ahmet Dere
farasin@hotmail.com

## Helwesta ewropiyan û hewldanên DTP'ê

Van rojên borî li Mêrdînê komkujiyek çêbû. Ev komkujî ji aliyê cehşan ve pêk hat. Encama sîstema cehştiyê bû sedema kuştin û qetilkirina bi hezaran kurdan. Êdî roja ku divê gelê kurd ji vê sîstemê hejmara qirêjiya bi salan bipirse hatiye. Ez naxwazim di vê nivîsê de li ser vê mijarê bisekinim. Ya ku ez dixwazim îro bikim mijara quncikê, helwesta ewropiyan û hewldanên DTP'ê ye.

Belê, hefteya borî hevserokê DTP'ê birêz Ahmet Turk hate Strasbourgê. Hefteyek beriya wî jî Sabahat Tuncel û Abdullah Demirbaş hatibûn heman bajarî û li Konseya Ewropayê hin hevdîtin pêk anîbûn. Ev du rayedarên DTP'ê tevli konferanseke di Senatoya Fransayê de jî bûn. Di heman konferansê de pir fransiz jî axivîn û der barê çareseriya pirsgirêka kurd de nêrîn û pêşniyazên xwe anîn ziman.

Piştî êrîşên 14'ê nîsanê ku dewleta tirk li dijî rayedarên DTP'ê pêk anîn, birêz Ahmet Turk du caran hate Ewropayê. Cara ewil ew çûbû Înglistanê, vê carê jî hate Strasbourgê.

Ez dixwazim bi bîr bînim ku di hefteya borî de Parlamentoya Ewropayê civîna xwe ya dawî pêk anî. Ji ber ku di 6 û 7'ê meha hezîranê de hilbijartinên heman parlamentoyê pêk tên wateyeke sempolîk ya wê civînê hebû. Di heman civînê de Parlamentoya Ewropayê bi xalekê taybet rewşa mafên mirovan ya li Tirkiyeyê, û bi taybetî jî zextên li dijî DTP'ê girt dest. Heman Parlamenê, di sala 2004'an de, piştî hilbijartinên dema borî, di civîna xwe a yekemîn de dosya Tirkiyeyê girtibû dest. Heman parlamenê di civîna xwe a dawî de jî mijara Tirkiyeyê niqaş kir.

Di encama niqaşan de mirov dikare bêje ku Parlamentoya Ewropayê da xûyan ku ew di der barê rewşa mafên mirovan en li Tirkiyeyê de şiyar e. Heman niqaşên ku hatin kirin weke perspektîf ji bo parlamenterên nû hatin ziman. Lewre mirov dikare bêje ku ji meha tîrmehê bi şun de wê PE'yê dosya Tirkiyeyê ji nû ve bigire rojeva xwe.

Hatina birêz Turk bû sedemê ku mijara Tirkiyeyê û ya kurdan bi şêweyeke zinde were niqaşkirin. Cendî ew ji aliyê koma çepan ve hatibe vexwendekirin jî bandora serdana wî li ser endamên komên din jî çê bû. Hatina birêz Turk bû sedemê ku operasyona li dijî DTP'ê ji aliyê piraniya endamên PE'yê ve were şermezarkirin. Lê belê, ji ber siyaseta durû ya Yekîtiya Ewropayê, Parlamenê jî bi dengekê bilind vê helwesta xwe diyar nekir.

Li gorî ku min şopand, mijara zextên dewleta tirk ku li dijî DTP'ê tê meşandin ji aliyê saziyên YE'yê ên weke Komisyon û Konseya Yekîtiyê ve jî tê şopandin. Lê mixabin, ji ber hejmarên berjewendîxwaz ên heman saziyan bêdengî li her qadê bandora xwe dimeşîne. Ev nêzîkatî li gorî krîterên Ewropayê jî nîn e. Digel hebûna dengê hin dostan, li Ewropayê dengeke munasib bilind nabe. Di pişt deriyan de pir niqaş çêdibin lê belê ev niqaş nabin sedemê bandoreke pratîk. Operasyona ku li dijî DTP'ê pêkhat tişteke sivik nîn e. Heke ev mijar bi awayeke hê zindetir, di hemû karê dîplomatîk ên DTP'ê de, were niqaşkirin ez dikarim bêjim ku wê encameke derkeve holê. Digel hatina birêz Ahmet Turk, Sabahat Tuncel û Abdullah Demirbaş li Ewropayê, li gorî ku ez dibînim, bi taybetî di nêzîkatiya hin rayedarên vê partiyê de, hê jî ev bûyer weke tişteke pir asayî tê dîtin. Bêguman dê ev rewş neyê qebûlkirin. Di vê demê de pêwîst e giraniyeke hewldanên DTP'ê di vî warî de werin bikaranîn.

**HAWAR**
**Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.**
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
**Bedri ADANIR**
***Adres:*** Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
***TEL:*** 0 (412) 229 00 30
***Fax:*** 0 (412) 229 00 39

Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
***Tel:*** 0 (212) 580 63 80
***Edene:*** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstiklal mah. İstiklal. Cad. ***No:*** 44 Seyhan Edene
**Yayın Türü:** Süreli

# ‘Bo êrîşa bombeyî TÎT’ê peywir da min’

## Hikmet Topalê bersûcê êrîşa bombeyî ya li parka Koşuyoluya Amedê ku bûbû sedema mirina 11 kesên bêguneh diyar kir ku fermana vê êrîşê Ustegmen daye û wî jî bombe li wê danî û ji dûr ve ew teqand

**SÎDAR BORAN** - AMED / ANF

Bersûcê êrîşa bombeyî ya Koşoyuluya Amedê ku 11 kesên bêguneh bûne qurban mikûr hat ku fermandarê wî ustegmenê bi navê Ahmet Şenturk ferman daye ku ew ligel astsubayekî bombeyê amade bikin û di nav sivîlan de biteqînin.

Tevî ku rayedar û çapameniya tirk bi israr xwest êrîşa bombeyî ya li Parka Koşuyoluya Amedê ya di sala 2006’an de pêk hat biavêjin ser PKK’ê jî rastî aşker dibin. Bersûcê êrîşê Hikmet Topal di îfadeya xwe ya emniyetê de mikûr hat ku fermana êrîşê ji aliyê ustegmen Ahmet Şentur ve hatiye dayîn û bi alîkariya astsubay Sedat wan bombe amade kiriye û teqandiye.

Îfadeya mijara gotinê li pêşberî Dozgerê Komarê Îsmaîl Aksoy û parêzerê Baroya Amedê Mehmet Îhsan Aytekin di 24’ê adarê de hatiye dayîn.

Hîkmet Topal ku bi eslê xwe ji Êlihê ye, li Îskenderûnê ji dayik bûye û li wê mezin bûye. Topal ku beşdarî civînên Ocaxên Ulkucuyan ên li Îskenderûnê dibe, piştî Fakulteya Beytariyê ya Zanîngeha Diclêyê qezenc dike bi malbatî li Amedê bi cih dibin.

### Têkiliyên bi leşkeran re ne nû ye

Bersûcê êrîşa Koşuyoluyê di îfadeya xwe de bi bîr dixe ku li Taxa Kaynartepe kolana 31. Apatmana Gungor di daîreya dikirin de bi cih dibin û piştî bicihbûna li Amedê jî têkiliyên wî yên bi leşker û polîsan re dom dikin. Der barê van têkiliyan de jî Topal ev agahî dan: “Di dema zanîngehê de bi polîsên qereqola li hundirê zanîngehê û bi yuzbaşî Umit Tarakçiyê li 7. Kolorduyê wezîfedar re têkiliyên min baş bûn. Tarakçi ji bo min burs derxist û alîkariya aborî da min.”

Hikmet Topal bi bîr dixe ku ji aliyê ciwanên welatparêz ve têkiliya wî ya bi polîs û leşkeran ve hatiye tesbîtkirin û ji bo dawî li van têkiliyan bîne ew hişyar kirine.

Topal di îfadeya xwe de destnîşan kir ku di tebaxa 2006’an de li Dibsitana Beytariyê ya Leşkerî ya Gemlika Bursayê wezîfeya leşkeriyê kiriye û li virê wî û Ustegmen Ahmet Şenturkê komando hev nas kirine û têkiliyeke nêz meşandine.

Li gorî îfadeya Hikmet Topal, ustegmen Ahmet Şenturk li Dêrsimê wezîfe kiriye û di operasyoneke ku di encama wê de 5 leşker mirine de ew jî birîndar bûye.



### Beşdarî Newroza 2009’an bûbû

Hikmet Topal di îfadeya xwe de têkildarî vegera xwe ya cihê leşkeriyê jî agahiyên berfireh dide û destnîşan dike dema disa çûye cihê leşkeriyê Albay ê fermandarê Tugoy a 57. bi wî re axifiya û derbarê teqînê de pirs jê kirine û jî bersiva, ‘Nizanim kê ev teqîn pêk anî, lê TÎT’ê girte ser xwe’ ew bersivandiye.

Kujerê 11 mirovên bêguneh beriya were binçavkirin tevî kesê bi navê Burhan ê alîkarî dabûyê beşdarî Newroz a 2009’an a Amedê jî bûye.

### Bi dilxwazî ketiye nav TÎT’ê

Hikmet Topal destnîşan dike ku di encama guftûgoyên bi ustegmen Ahmet Şenturk re de wî bi dilxwazî xwestiye hevkariyê bike û li ser vê daxwazê fermandarê wî piştî demeke kin li ser mijarê hatiye pê re axiviye: “Piştî 15 rojan fermandar hate cem min û der barê tiştê ez bikim de wisa axivî: ‘Li dijî êrîşên li bajarên rojava em jî li rojhilat (bajarên kurdan) bi heman şêwazî bersivê didin. Her leşker sîxurek e, her sîxurek jî endamê Tugayên Tolhildêr ên Tirk (TÎT) ye. Hemû çalakiyên çerçoveya wan yek e yên TÎT’ê ne. Her kes dikare bi derfetên xwe çalakiyan pêk bîne.’ Li ser vê yekê min jî got ez Amedê nas dikim û tevahiya xelkê wirê terorîst in. Min pêşniyar kir ku çalakiyeke li wirê dê deng vede.”

### Li Amedê bombe hate amadekirin

Hikmet Topal diyar dike ku piştî wî û ustegmen Ahmet Şenturk li ser çalakiyê li hev kirine hatiye Amedê û tevî ‘Sedat Astsubay’ê ku pê dane naskirin re amadekariya çalakiyê kiriye.

Der barê amadekariyên êrîşa bi xwîn de jî Topal ev agahî dan: “Di 1 an 2’ê îlonê de ji Stenbolê bi balafirê hatim Amedê. Di 10’ê îlonê de jî bi Sedat Astsubay re min hevdîtin pêk anî. Sedat Astsubay teqemeniya di erebeyê de li pêşberî min di hundirê tupê biçûk de amade kir û ez fêr kirim ka çawa dê were bicihkirin. Paşê min ew bire mala nasê xwe Burhan ku li taxa Kooperatîfevlerê ye. Bi hinceta ku ez ê keçika hevala xwe bibim malê min destûr xwest û paşê min Sedat Astsubay bire wir. Li vir me bi hev re bombe amade kir. Wê şevê ez li wir mam û min biryar da karê mayî sibê biqedînim. Di 11’ê îlonê de bombeya min amade bû. Min bombe li gor sînyala bêtêlê amade kiribû. Piştî şevekê ligel malbata xwe mam. Roja din çûm min çend fotoyên bombeyê girtin û min ji Burhan re got piştî teqînê, çalakiyê li ser navê TÎT’ê qebûl bike. Min ji Burhan re got ez ê vê çalakiyê li dijî polîsan pêk bînim. Lê heger tiştekî cuda derkeve holê bila tevî wêneyan di înternetê de çalakiyê li ser navê TÎT’ê aşkera bike.“

### Xwest nav û paşnavê xwe biguhere

Di îfadeyê de bi rengekî fermî pêkanîna çalakiyê Hikmet Topal digire ser xwe û destnîşan dike ku ji bo bersivdayîna bombeyên li rojavayê Tirkiyeyê li herêmên turîzmê teqiyan bi fermana Usteyman Ahmet Şenturk bi armanca tirsandin û çewisandina gel ev êrîş pêk aniye. Her wiha di îfadeyê de ji bo ji aliyê malbatên qurbanên êrîşê ve zirar neyê dayîn daxwaz kiriye nav û paşnavê wî were guhertin.

### Hedefa pêşî semta Ofîsê bû

Hikmet Topal di îfadeya xwe de radigihîne ku li gor fermanên Sedat Astsubay tevgeriyaye û plana wî teqandina bombeyê li herêma Ofîsê bû lê belê ji ber ku tim li wir polîs hene wî biryar guherandiye û Koşuyolu destnîşan kiriye. Der barê roja êrîş pêk anî de jî Hikmet Topal ev agahî dan: “Piştî min bombe bi giştî amade kir û di termosê de bi cih kir ji bo neyêm naskirin min şawqeyek da serê xwe û ketim rê. Burhan li pêşiya min dimeşî. Ji bo ku kamerayên li bajêr min tesbît nekin min tim serê xwe tewand. Ji aliyê Dibistana Dayikê ve em ketin Parka Koşuyoluyê û li wir min Burhan ji çavan winda kir. Paşê ez derketim ser rê û min bombe li ber dîwar bi cih kir. Paşê min gomlekên li ser xwe guhertin û ez çûm 150 metroyî dûrî bombeyê sekinîm. Min xwest bombeyê biteqînim, wê kêliyê wesatiyeteke polîsan derbas bû. Piştî wesatiya polîsan derbas bû min mêze kir termosa bi bombe ne li cihê xwe ye. Li nêzî wir du jin hebûn û termos li cem wan bû. Min zarok nedîtin. Yekser min pêl mandala bêtelê kir û teqîneke mezin pêk hat. Mala me nêzî wir bû. Çûm malê û ji şaneşînê min rewş temaşe kir. Paşê jî min encam ji televizyonan şopandin.”

Hikmet Topal ragihand ku ew rojekê piştre çûye Êlihê û di 14’ê îlonê de dîsa zivirîye Amedê. Di vê navberê de wî bihîstiye ku bûyer di înternetê de li ser TÎT’ê hatiye qebûlkirin û wêne jî hatine weşandin.”

### Îfade guhert

Hikmet Topal ku endamê Komeleya Hezkiriyên Heywanan a Amedê ye piştî îfadeya di 24’ê adarê de, di 26-27’ê adarê de du îfadeyên cuda dan.

Hikmet Topal di van îfadeyan de gotinên xwe yên pêşî red kirin û îdia kir ku çalakî wî bi tena serê xwe pêk aniye û agahiya leşkeran ji vê yekê nîn e. Her wiha 3 teqînên li Îzmîrê pêk hatine jî girtin ser xwe.

---

## Bi çeka cerdevanan kesek birîndar bû

**RIHA**

Li gundê Kullupinarê ya navçeya Wêranşara Rihayê kurê cerdevanê bi navê Fuat Erbekler yê bi navê Muzaffer Erbekler dema çeka bavê xwe ya cerdevaniyê paqij dikir, xwe birîndar kir. Erbekler rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Wêranşarê. Piştî mudaxeleya ewil, Erbekler sewqî Nexweşxaneya Dewletê ya Rihayê hat kirin. Hate zanîn ku Erbekler demek berî niha xwestiye çeka xwe dayne lê rayedarên leşkeriyê daxwaza wî qebûl nekirine û çeka wî hilnedane.

## Li Êlihê kesek hate girtin

**ÊLIH**

Yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Êlihê pêr bi ser gelek malan de girtibûn. Di serdagirtinan de Faruk Karabaş, Nurettîn Ayman û Mehmet Îlbasan hatibûn binçavkirin. Piştî pirsiyariyê ew derxistin dozgeriyê û dozger jî bi hinceta, "propagandaya rêxistinê kirine" bi daxwaza girtinê sewqî dadgehê kirin. Dadgehê tenê Îlbasan bi hinceta, "propaganda kiriye" girt û şand girtîgeha Tîpa M a Êlihê.

## Bajar bi bajar rewşa cerdevaniyê

Piştî komkujiya li gundê Zankirta navçeya Şemrexa Mêrdînê nîqaşên li ser rakirina pergala cerdevaniyê bi berfirehî ketin rojevê. Li bajarên kurdan li gorî hejmarê herî zêde çerdevan li Colemerg û li dû wê jî li Wanê hene.

Pergala cerdevaniyê bi biryara hejmar 9632 ya Destaya Wezîran di roja 27’ê hezîrana 1985’an de qaşo bi daxwaz dest pê kir, lê di sala 1992´an de hikûmetê dest pê kir û mehane da cerdevanan. Îro rewşa awarte nîn e, di dema şer de cerdevanan êrîşî gel dikir, di demên dawî de li ser rantê dest bi şerê navxweyî kirin

### Cerdevanî bû pergala sûc

Di navbera salên 1984 û 1992’yan de ji her 3 cerdevanan yek jê ji ber ku sûc kirin çek ji wan hat standin. Tenê di nav salên 1986 û 1996’an de ji ber sûcê kirin 23 hezar û 222 cerdevan ji cerdevaniyê hatin girtin.

### Maliyeta pergala cerdevaniyê

Di sala 2008’an de ji bo 10 hezar cerdevanên din bên girtin kodro hat derxistin. Bi vê biryarê tenê li Colemergê 758 cerdevan hatin girtin. Li gorî daneyên YE’yê li Tirkiyeyê 57 hezar cerdevan hene. Lê hin çavkanî destnîşan dikin ku cerdevanên veşartî, cerdevanên bajaran jî hene û hejmara wan li dora 70-80 hezar e. Salê maliyeta cerdevaniyê 227 milyon TL ye.

Li gorî daneyên Wezîra Karên Hundirîn ya Tirkiyeyê Meral Akşener ya dema 1996’an ji bo lêçûnên cerdevaniyê di bûçeyada sala 1997’an 11 trilyon î 500 milyar TL hetiye cihêkirin.

### Li gorî bajaran hejmara cerdevanan

Li gelek bajaran hejmara cerdevanan kêm dibe lê li Colemêrg, Sêrt û Bedlîsê zêde dibe. Li gorî hejmara cerdevanan Colemêrg yekemîn, Wan duyemîn û Amed jî sêyemîn e. Li gorî vê li Amedê 5 hezar û 187, li Şirnexê 6 hezar û 756, li Êlihê 2 hezar û 887, li Çewlîgê 2 hezar û 511, li Bedlîsê 3 hezar û 730, li Mêrdînê 3 hezar û 323, li Mûşê hezar û 860, li Sêrtê 4 hezar û 661, li Wanê 7 hezar û 320, li Colemêrgê 7 hezar û 614, li Dêrsimê 368, li Semsûrê hezar û 485, li Agiriyê hezar û 838, li Ardahanê 91, li Elezîzê 2 hezar û 83, li Dîlokê 555, li Îdirê 362, Li Kilîsê 33, li Mereşê 2 hezar û 236, li Qersê 558, li Meletiyê hezar û 365, li Rihayê 934. Li gel hemû kirêtiya cerdevanan hikûmet hê jî di pergala cerdevaniyê de isara dike. **ÊLIH / ANF**

## Li Nazîliyê 2 xwendekar hatin girtin

Ji 3 xwendekarên zanîngehê yên li navçeya Nazîliya Aydinê hatin binçavkirin, 2 jê bi hinceta "Propagandaya rêxistinê" hatin girtin. Yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Nazîliyê di encama serdagirtina malan de 3 xwendekarên zanîngehê girtibûn binçav. Piştî pirsiyariya li midûriyeta polîsan, 3 xwendekar derxistin dozgeriyê. Xwendekarên li dozgeriyê îfadeyên wan hatin girtin bi daxwaza girtinê sewqî dadgehê hatin kirin. Dadgehê C. T. serbest berda û bi hinceta, "Propagandaya rêxistinê" E. D. û C. A. jî girtin. **AYDIN**

## Di teqîna Şirnexê de 3 cerdevan mirin

Li gundê Gilindora bi ser navenda Şirnexê pêr teqîn pêk hat ji ber vê teqînê 3 jê cerdevan bi giştî 5 kesan jiyana xwe ji dest da. Teqîn di dema xebatên înşaata qereqolê berdewam dikir de pêk hat.

Gundê Gilindora Şirnexê di sala 1990’î de ji ber zextên cerdevanan û dewletê hatibû valakirin. Li gund lêkirina qereqolê didomiya pêr di saetên êvarê de teqîn pêk hat û ji ber vê teqînê kurê Sercerdevan Nimet Hanedan ê bi navê Abdulmutalîp Hanedan û cerdevan Selman Bîlîr û Mehmet Bîlîr jiyana xwe ji dest dan. Cerdevanên ku mirin rakirin nexweşxaneya leşkerî ya Şirnexê. Di teqînê de ligel her sê cerdevanan 5 kes mirin û 2 kes jî bi giranî birîndar bûn.

Piştî otopsiya kesên di teqînê de mirin hat kirin cenaze ji aliyê xwediyên wan ve hatin girtin û duh cenazeyên wan hatin definkirin. Di demên dawî de li ser mijara cerdevanan nîqaşên berfireh tên kirin û gelek kes diwazin ku pergala cardevaniyê were rakirin. **ŞIRNEX**

www.arsivakurdi.org

# Giliyê Tirkiyeyê li NY'ê kir

**Nerazîbûnên li hemberî bombebarankirina başûrê Kurdistanê û Herêmên Parastinê yên Medyayê ya ji aliyê Tirkiye û Îranê ve derket asta herî bilind. Parlamenterê kurd Mehmûd Dr. Osman got divê pêşî li ber van êrîşan bê girtin**

**MAZLUM OZDEMÎR**
**SERBAZ SIYAMEND** HEWLÊR / DÎHA

Bomberana Tirkiye û Îranê ya li ser gundên sînor ên Herêma Federal a Kurdistanê ya bi mebesta ku gerîlayên PJAK û PKK'ê li vir in rastî bertekan hat. Parlamenterê Parlamentoya Iraqê Dr. Mehmûd Osman diyar kir ku ji ber ku her du welat sînorên Iraqê îhlal dikin ew ê mijarê bibin Netewên Yekbûyî.

Li hemberî bombebarana artêşên Tirkiye û Îranê ya li ser Herêma Federal a Kurdistanê bertek zêde dibin. Piştî Tirkiyeyê Îranê jî ji bilî avêtina topan li hemberî herêmê êrîşa hewayî pêk anî û ev yek di Parlamentoya Iraqê de bu sedema nerazîbûnan. Nezî 70 parlamenteran der barê mijarê de daxuyaniyek da û bûyer şermezar kirin. Welatên Yekbûyî yên Ereban cara yekem êrîşên Îranê şermezar kir û xwest ku êrîş demildest rawestin. Parlamenterê Parlamentoya Iraqê Mehmûd Osman anî ziman ku gelên sivîl di êrîşên her du welatan de zirarê dibînin û xwest êrîş rawestin.

Parlamenter Mehmûd Osman anî ziman ku bi îdîaya gerîlayên PKK û PJAK'ê li herêmêne bombebaran pêk tê û wiha got: "Ew tên êrîşî başûrê Kurdistanê dikin, mirovan dikûjin, zirarê didin gelên sivîl, Gel neçar dimînê ku li cih û warê xwe koç bike." Osman balkişand ku Îranê jî wekî Tirkiyeyê bi dest êrîşên hewayî kiriye û wiha pê de çû: "Ew dibêjin cihên ku em êrîş dikin li wan deran PKK'î û PJAK'î hene lê wisa nîn e. Mebesta wan zirar dayîna başûrê Kurdistanê ye."

**'Divê DYA êrîşan protesto bike'**

Osman destnîşankir ku ger Îran û Tirkiye di siyasetên xwe de çaraseriya pirsgirêka kurd esas bigirin şerê bi dawî bibe û wiha got: "Lê her du welat jî di neçareseriyê de bi israr in. Di encama her bûyerê de ew bên me bomberana bikin em wê yekê qebûl nakin." Osman da zanîn ku piştî êrîşan li hember her du welatan bertek zêde bûne û wiha pê de çû: "Parlamentoya Iraqê protesto kir, hikumeta herêmê protesto kir, Ewropayê protesto kir lê Amerîkayê hê protesto nekir. Amerîka li hember îranê ye gelo çima heta niha daxuyaniyek ne da."

**Divê pêşî li ber êrîşan bê girtin**

Mehmûd Osman anî ziman ku divê Hikumeta Kurd ya Herêmê û Hikumeta Navendî ya Iraqê bi zimanekî tund êrîşan şermezar bikin û wiha pê de çû: "Ger ev pirsgirêk neyê çareserkirin divê Hikumeta Iraqê mijarê bibe NY'ê. Giliyên Tirkiye û Îranê ji NY'ê bike. Ger mijar biçe NY'ê pêşiya êrîşan dê bê girtin."

**Îsal 670 malbatan koç kir**

Di encama êrîşên Îran û Tirkiyeyê de heta niha dehan sivîlan jiyana xwe ji dest da û dehan gund hatin valakirin. Di encama êrîşan de gund talanbûn û gelek sewal mirar bûn. Di encama êrîşan de îsal 670'î malbatî koçkir. Her wiha Tirkiyeyê di êrîşan de ji derveyî peymanên navneteweyî tevgeriya û gelek caran bombeyên mîsket, fosfor û napalm bi kar anîbû.

## Çend êrîşên ku sivîl hatin kuştin

✓ Di tîrmeha 1991'ê de Tirkiyeyê bi hinceta 'kampên PKK'ê lê ne êrîş kir û gundên Zaxoyê; Sivi, Miraz, Sipinler, Basi, Bindar, Bizo û Biyaz wêran bûn. Di êrîşê de 5 kes mirin.

✓ Di 11'ê cotmehê de 5 gund hatin bombebarankirin û 9 gundiyan jiyana xwe ji dest da. Di operasyonê de gazên fosfor yên kîmyasal hatin bikaranîn.

✓ 25'ê cotmeha 1991'ê de di encama operasyona ku 3 rojan dom kir de derdorên Zaxoyê hatin bombebarankirin û 12 gundiyan jiyana xwe ji dest da.

✓ Di 3-5'ê mijdara 1991'ê de bi piştgiriya KDP û YNK'ê ve li Çelê û Heftanînê êrîş pêk hat 12 gundî hatin kuştin û dehan gundî birîndar bûn. Gelek birîndar jin û zarokbûn. Di laşên kesên birîndar de hebûna şewatê îdîayên Tirkiye çekên kîmyevî bi kar tîne piştrast kiribû.

✓ Di nîsana 1994'an de artêşa tirk 15 kîlometreyan kete Başûr û di êrîşê de ji jê 3 zarok û bi giştî 4 sivîlan jiyana xwe ji dest da. Di operasyonê de peşmergeyên ku bi tevî artêşa Tirkiyeyê tevdigeriyan bûn hedef û 20 peşmerge hatin kuştin.

✓ Tirkiyeyê di tirmeha 1996'an de êrîşî herêmên Haftanin, Sinat, Zap û Kumri kir dîsa cihên sivîl hedef girt û gelek sivîlan jiyana xwe ji dest da.

✓ Tirkiyeyê di 29'ê kanûna 1996'an de bi piştgiriya KDP'iyan de Kela Spî, , Erca, Mêrgamiş û Bizinike bombebarankir û gundê Bazenî ji holê rakir. Di êrîşê de ji jê 3 zarok û 5 gundî hatin kuştin 9 gundî jî birîndar bûn.

✓ Di encama êrîşa 15'ê tebaxê 2000'an de herêma Kandakolê hat bomberankirin 30 sivilî jiyana xwe ji dest da û dehan sivîl birîndar bûn.

# Herêma Başûr petrolê îhraç dike

Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê diyar kir ku ew ê ji meha hezîranê pêve dest bi îhraçkirina petrolê bikin.

Wezîrê Çavkaniyên Xwezayî yê Herêma Kurdistanê Aştî Hewramî di destpê de ji bîra petrolê ya Tawkê ya li nêzî Zaxoyê 60 ton varîlên petrolê yên hatine derxistin îhraç bikin. Piştre jî ji herêma Taq Taqê rojê 40 ton varîlên petrolê dê bêne îhraçkirin.

Demeka dirêj e ku di navbera Herêma Kurdistanê û hikûmeta navendî ya Bexdayê ku giraniya wê ji şiiyan pêk tê de nakokiyên ji bo îhraçkirina petrola Herêma Kurdistanê hebûn. Bexda naxwaze peymanên Herêma Kurdistanê yên bi şîrketên petrolê re kirine nas bike. Hewramî anî ziman ku dahatuya petrola Herêma Kurdistanê ji bo ku hemû Iraq jê îstîfade bike dê ji bo hesabeke Iraqa Federal bê neqilkirin.

Petrola ji herêma Tawkê tê derxistin lê li Fîşkaburê bi ser xeta petrolê ya Iraq-Tirkiyeyê ve girêdan. Ji bo Taq Taqê jî ev xet heta Hewlêrê bê dirêjkirin.

Wezîr Hewramî got, hedefa me ew e ku heta dawiya salê rojê 250 ton varîlên petrolê îhraç bikin. Bîrên petrolê yên li Taq Taqê ji aliyê şîrketeke ya bi navê General Enerjî û şîrketeke Qanadayî ya bi navê Addaks Pertoleumê ve, bîrên Tawkê jî ji aliyê şîrketeke Norweçî ya bi navê DNO'yê ve tê xebitandin.

Di 6'ê gulanê de koma petrolê ya Qanadayî Heritage Oil aşkera kiribû ku di encama xebatên hatine kirin de li Herêma Federal a Kurdistanê rezervên dewlemend ên petrolê peyde kirine.

Di daxuyaniya nivîskî ya Heritage Oilê de hatibû aşkerakirin ku rezerva Mîran-Westê di navbera 2.3 û 4.2 milyar varîlan de ye. **HEWLÊR**

# Grevên birçîbûnê yên DTP'iyan duh jî dom kirin



Grevên birçîbûnê yên bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser DTP'ê hatine destpêkirin berdewam dikin. Li Pirsûsa Rihayê ji bo 2 rojan greva birçîbûnê hate destpêkirin û li Êlih û navçeya Silopiya Şirnexê jî grev bi girseyî didomin. Her wiha li Şirnexê jî bi sedan kesî ji bo piştgiriyê greva birçîbûnê ya 2 rojan ku bi armanca şermezarkirina operasyona li dijî DTP'ê hatî destpêkirin, DTP ziyaret kir.

Grevên birçîbûnê yên bi armanca şermezarkirina zordariyên li ser DTP'ê hatine destpêkirin berdewam dikin. DTP'a Pirsûsa Rihayê bi beşdariya 80 kesî dest bi greva birçîbûnê ya 2 rojan kir. Di greva li avahiya partiyê de Serokê Rêxistina Navçeyê Ahmet aydenîz diyar kir ku heta havên wan serbest bên berdan dê çalakiyên xwe bidomînin û banga beşdarî û hîstiyariyê li gel kir.

**Li Êlihê grev didome**

Greva pêr li Parqa Ataturk a Êlihê ji aliyê DTP'ê ve hatibû destpêkirin duh bi dawî bû. Di greva birçîbûnê ya ji hêla sedan kesî ve tê ziyaretkirin de Serokê DTP'a Êlihê Ozcan Erdem, Parlementera DTP'ê Ayla Akat Ata, Şaredarê Êlihê Nejdet Atalay, Şaredarê Kercewsê Esat Oner, Şaredarê Hezoyê Raşît Haşîmî, Şaredarê Bekîrhanê Selahattîn Karabulut, Şaredarê Êlihê yê berê Huseyîn Kalkan, endamên DOKH, YDG-M, rêveberên rêxistinên DTP'ê û nûnerên saziyên civakî jî di grevê de cih girtibûn. Girseya beşdarî grevê bûyî bi kesên hatine serdanê re li ber kemençeyê heta derengî şevê govend girêdan. Komên mûzîkê yê Navenda Çand û Hunerê ya Êlihê (BKSM) jî bi stranên xwe piştgirî dan grevê. Di grevê di sloganên, "Bila destên dirêjî DTP'ê dibin bişkên" û "PKK gel e gel li vir e" hatin avêtin.

**Serdanên greva li Silopiyê**

Greva birçîbûnê ya li avahiya DTP'a Silopiyê hatibû destpêkirin duh jî dom kir. Şaredarê Şirnexê Ramazan Uysal, Şaredarê Silopiyê Emîn Togurlu, Şaredara Qilabanê Yusuf Temel û bi sedan kesî greva birçîbûnê ziyaret kir. Di çalakiyê de sloganên, "Zordarî me bêzar nakin" û "Bijî Serok Apo" hatin avêtin. Şaredarê Silopiyê Togurlu diyar kir ku zordarî gelê kurd bêzar nakin û dê têkoşîna xwe heta dawiyê bidomînin. Şaredara Qilabanê Sîncar jî balkişand ser Roja Dayîkan û diyar kir ku diyariya niha bidin dayîkan a herî mezin aştî ye.

**Şirnexiyan eleqeke nîşan da**

Greva birçîbûnê ya DTP'a Şirnexê ku nêzî 100 kes beşdar bûne di nav rojê de ji hêla bi sedan kesî ve tê ziyaret kirin. Serokê DTP'ê ya Şirnexê Halîl Îrmez di dema serdana bi sedan kesî de axaftinek kir û wiha got: "Gelê kurd dê di nav hemû şert û mercan de têkoşîna xwe berdewam bike. Gel xwedî li têkoşîna xwe derdikeve." Şaredarê Şirnexê yê berê Ahmet Ertak jî diyar kir ku têkoşînek pîrozewer didin û gelê kurd dê di têkoşîna xwe de teqez bigihe serkeftinê. **ŞIRNEX / ÊLIH / RIHA / DÎHA**




## Turk: Gotina serokomar pêngavek e

Li navçeya Qosera Mêrdînê bi armanca ku operasyonên li ser DTP'ê pêk hatine protesto bikin, greva birçîbûnê dest pê kir. Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk çû serdana kesên ku kentine grevê û bal kişand ser gotinên Serokomar Abdullah Gul yên wekî 'pirsgirêka kurd pirsgirêka Tirkiyeyê ya sereke ye û divê çareser bibe' û wiha berdewam kir: "Ji bo çareseriya pirsgirêka kurd ev pêngavek e. Çimkî me her tim digot ku her du gelên ku bi hevre dijîn, heta azad nebin dê Tirkiye ji azad nebe." Her wiha Turk da zanîn ku ji bo çareseriya pirsgirêka kurd derfetên girîng hene û wiha pê de çû: "Di demên dawî de daxuyaniyên PKK'ê , ji bo çareseriya pisrgirêk kurd pêngavek gelek baş e. Eger ku pirsgirêka kurd neyê çareser kirin emê bi talûkeyên mezin re rû bir û bimînin." Turk destnîşan kir ku gotinên serokomar Gul ên wekî 'ji bo çareseriyê divê hêdî hin tişt bên kirin' bi hêvîne.

Her wiha parlamenterê DTP'ê yê Stenbolê Akin Bîrdal, parlamenterê DTP'ê yê Muşê Sirri Sakik, nûnerên ÎHD a Mêrdînê û nûnerên Egîtîm Sen a Qoserê jî ligel Ahmet Turk çûn serdana kesên ketinbûn greva birçîbûnê.

## Li Çardêranê kongreya DTP'ê

**WAN**

Rêxistina DTP'a Çardêrana Wanê li avahiya partiyê kongerya xwe pêk anî. Endamê PM'a DTP'ê Veysî Dîlekçî, Rêveberê DTP'a Wanê Fadil Bariştiran, Berdevka DOKH'a Wanê Yildiz Tekîn jî beşdarî kongreyê bûn. Piştî rêzgirtinê Rêveberê DTP'a Wanê Fadil Bariştiran axfatinek kir. Bariştiran balkişand ser serkeftina DTP'ê ya li herêmê û anî ziman ku partiyên din bûne partiyên tabelayê. Endamê PM'a DTP'ê Dîlekçî jî diyar kir ku pergalê bi darbeya siyasî bersiv daye serkeftina DTP'ê ya di hilbijartinan de. Piştî axaftinan di encama hilbijartinê de Metîn Adugît wekî serokê rêxistinê, Mehmet Sakiz, Orhan Kurnaz, Medenî Aksak, Haci Darak, Îskender Bîlîcî, Zekî Altay, Mehmet Salîh Aladag, Cengîz Koç, Burhan Agaç û Şakîr Topçu wekî rêveber hatin hilbijartin.

## DTP'a Sariqamişê îradeya xwe nû kir

**QERS**

DTP'a Sariqamişê li avahiya partiyê kongreya xwe pêk anî. Endamên PM'a DTP'ê Huseyîn Altun, Şukran Gurbuz, Şaredarê Kaxizmanê Mehmet Alkan, Şaredarê Dîgorê Muzafer Kutay û Şaredarê Dagpinarê Ayhan Erkmen, Serokê DTP'a Qersê Velî Mukyen û gelek kes beşdarî kongreyê bûn. Piştî rêzgirtina ji bo şehîdên demokrakiyê Endamê PM'a DTP'ê Hueyîn Altun axaftinek kir û balkişand ser serkeftina partiya xwe ya di hilbijartinên herêmî de. Altun diyar kir ku gelê kurd peyamek zelal daye pergalê û li hemberî vê yekê bi operasyonan di ser partiya wan de hatine. altu ndiyar kir ku tu caran dê nekarin gavê bi wan paşve bidin avêtin. Endama PM'a DTP'ê Şukran Gurbuz jî xwest ku gel li hemberî polîtîkayên qirêj hişyar be. Di encama hilbijartinan de Aydin Alkan wekî serokê nû hate hilbijartin.

## Endamên YDG-M'ê derketin geştê

**HATAY**

Endamên Meclîsa Ciwanên Welatparêz û Demokratîk (YDG-M) di çarçoveya geşta her sal bi kevneşopî dikin de hatin cem hev. Endamên Meclisa Ciwanên Welatparêz û Demokratîk (YDG-M) di çarçoveya geşta her sal bi kevneşopî dikin de li Cihên Geşt û Restoranda Batiayaz Vadî ya Navçeya Samandaga Hatayê de hatin cem hev. Seroka DTP'a Navçeyê Fatoş Yener balkişand ser zordariyên li ser partiya wan tên meşandin û ev zordarî şermezar kirin. Endamê YDG-M'a Hatayê Necmettîn Yilmaz jî diyar kir ki wekî xwendekar dê her tim têkoşîna xwe berdewam bikin. Yilmaz anî ziman ku hindî diçe bihêztir dibin. Geşta ciwanan bi govendên li ser stranên kurdî berdewam kir.

# Komkujiya Zankirtê çima aşkera bû?



Îrfan AMÎDA

Ligel ku destê min lê nagere li ser vê bûyera ku li Mêrdînê qewimîye binivîsim jî tiştên ku di çapemeniya tirkî de têne nivîsandin û di TV'yan de têne nîqaşkarin û ji aliyeke din ve jî tiştên di nav civakê de têne axaftin, dide xuyakirin ku divê ji gelek hêlan ve ev bûyer bê nîqaşkirin. Destnîşan kirina sedemên wê an jî zelalkirina bûyerê tenê dê bi kêrî tu tiştî neyê an bi kêrî pir hindik tiştan bê. Ev yek ji bo civaka kurd derbas dibe. Ya na xwediyên konsepta ku tê meşandin, statuyên herêmê û rol jî belav kirin e. Her tişt vê gavê li gorî dilê wan dimeşe.

Lê kurd çiqasî bi dorfirehî dixwînin, a girîng ev e. Divê çawa bê veçirandin û di kîjan pêywendiyê de bê nirxandin gelo? Û li gora wê nirxandinê dê çi bêne kirin?

Helbet dema vê bûyerê dinirxînim, dizanim ku sedem cerdevanî ye û ji serî heta binî ev guneh yê ku ew çek dane destê cerdevanan e. Şopa tiliya dewletê ya bi qirêj li ser hemû meytan heye. Dibe ku di plansaziya vê komkujiyê de siberojê hin tiştên din jî zelal bibin. lê ev yek dê tu kesî ji me nebehetîne.

Beriya her tiştî ev encama konseptekê ye ku sedem û armanca seretayî ya avakirin û bikaranîna cerdevaniyê jî di çarçoveya vê konseptê de hatiye formulekirin. Ji bilî cerdevanî û muxbîrtî/altaxtiyê, qaçax, çeteyên diziyê, çandin û firotina esrar û eroînê, fihûş tevde argumanên vê konseptê ne û aşkera têne birêvebirin. Bi vî awayî jî di hişê civakê de hem kaoseke siyasî hem jî sosyolojîk diafirînin û bêhiqûqiyê serdest dikin.

Yek ji pêngav û diyardeyên girîng ya serdestîbûyîna bêhiqûqiyê, bidûrxistina civakê ya ji dînamîkên wê yên hundurîn e. Yek jê jî afirandina rewşeke bêewlekarî ye. Ev ji felsefeya dagirkeriyê tê. Piştî ku ev rewş hate avakirin êdî gava duyem destpê dike di çarçoveya vê konseptê de. Di gava duyem de êdî bûyerên sosret ku bala hemû dinyayê bikişînin derdikevin ser sahneyê. Bi vî awayî jî dagirkeriya xwe manîpule dike li hember dinyayê û civaka xwe. Lê ji vê armancê giringtir li hêviya pêkhatina armanceke din e. Heger girseyeke zêde û karîger ji civaka mêtingeh dilê xwe bibijîne çand û hiqûqa mêtîngeran armanca xwe ya bingehîn jî pêk tînin. Rasterast bi elementên welatê mêtîngeh û bi genetîka civaka mêtîngeh dilîzin. Derûniya mêtingehiyê ya têkçûyî û kompleksa xwebiçûkdîtinê diafirînin. Û heger civak bi dînamîkên xwe yên hundirîn li hember vê bêhiqûqî û kaosê hiqûqekê ava neke gelekî nêzîkî têkçûnê dibe.

Rewşa welatê me û civaka me jî, di vê pêywendiyê de, divê bê nirxandin. Ji ber ku ji zû ve ye civaka kurd di nav tevgereke siyasî û pêvajoyeke veguherînê de ye civakake dînamîk bû û di pêvajoya têkoşîna neteweyî de, li gel kêmasiyên xwe û li gel ku ne nivîskî bû jî, hiqûqeke nû ava dikir, mudaxaleyeke bi vî rengî dê bihata kirin û xuyaye dê hê jî bê kirin.

Ji loma jî ez di wê baweriyê de me ku ev bûyer, wekî gelek bûyeran dikarîbû bihata veşartin û têxistana stûyê PKK'ê, lê di çarçoveya vê konseptê de, ji bo ku ev bûyer rola xwe bilîze, di roja ewilî de hate aşkerakirin. Bi vî awayî jî nîqaşên li ser pergala cerdevantiyê jî dibe yek ji argumanên vê konseptê. Heger mirov bala xwe bide rojname û bernameyên TV'yan bi awayekî zelal dê ev yek bê dîtin.

Heger siyaseta kurd û dînamîkên wê, saziyên wê yên sivîl û demokratîk argumanên xwe yên siyasî tenê li ser pergala cerdevantiyê û tasfiye kirina wê ava bikin, li kişifkirina vê bûyerê bigerin, mixabin wekî kesekî dê min têr nekin. Divê em bikaribin hin argumanên sosyolojîk biafirînîn û bi xebateke sosyalîzasyonî dînamîkên xwe yên hundurîn bicebirînin ku li hember vê bêhiqûqiyê hiqûqekî biafirînin. Lewra bi destnîşankirina sûcdaran tenê tu bendên qewîn li hember vê pêlê dê neyên avakirin.

Helbet teqez divê mirov doza tasfiyekirina pergala cerdevaniyê û rehabîlîtasyona cerdevanan bike. Lewra travmayên ku di vê pêvajoyê de hem ji ber kirinên cerdevanan di nava gel de hem jî di nav malbatên cerdevanan û wan de hatine holê hewcedariya rehabîlîtasyonê derdixe holê. Lê heger li gel vêya polîtîkayên sosyalî jî neyên afirandin û li benda însafa dewletê bê sekinandin dê problem û bûyerên hê mezintir derkevin pêşiya vê civakê.

# Teşiya dayika teşîrês

*Dayika teşîrês,*
*teşî dîsa li destê te ye wekî hercar birêsîne*
*rîsê xwe birêsîne diya min*
*teşîba li min hatiye xezebê bi ser serê min de tofanê dibarîne*

*Rîsê xwe birêsîne*
*ji nava kezeba min hebo hebo bikişîne êşên min*
*jana nava dilê min birêsîne*
*rîs ji giyana min çêbike bila gewherê te lê bibiriqin*
*ji jînenasiya min ta bi ta, qevd qevd bipêçe*
*ji pêr*
*ji duh*
*ji îro bide ser hev hiriya keriyê kederên min*

*Dema min dikuştin*
*û min di erdê re bi ser dirikan ve dikişandin*
*te bi dizî dida dû min*
*te bi dizî ji ser dirik û pîjikên li ser rêça kuştina min*
*tayên mirinê yeko yeko kom dikir*
*te li dû min bi dizî teşiya xwe ba dida dirêsiya*
*tu wê demê teşîrêsiya mirina min bûyî*

*Îro ez jîndarê te me*
*li ber dilê te me*
*serê min li ser çoka te ye*
*de îcar birêse diya min*
*bi teşiya xwe birêse*
*û bike rîsê navenda neha û berê*

*Tu dema teşî ji destê xwe berdî ez ê xwe bixwim*
*ez ê xwe li bejna çiyayan wer kim*
*ez ê xwe li deşt û beriyan bela kim*
*ez ê bi piyê pêxwas li ser dirikan gêle bikim*
*ez ê bi dev û diranên xwe*
*çewal bi çewal keda xwe bipîvim û birêjim*
*ez ê bi destê xwe xwe bifiroşim*
*ez ê bi lingê xwe biçim mirinê*

*Dema tu teşiyê deynî*
*ez ê birêsim rîsekî stûr ji porê serê xwe*
*ez ê mûyên canê xwe ta bi ta helgirim*
*û bikin rêsiyê sêpika ber deriyê te*
*û ez ê serê xwe biximê, xwe bixeniqînim*

*Dayika min birêse teşiya xwe ya hezar salan*
*her li badanek teşiya te sewsek li min dixe*
*her vegerek benê te yê rîs min li min dipêçe*
*her cara ku tu teşiyê li ser çoka xwe dixî*
*(ciyê ku min serê xwe dadianî serê û ez bi lorikên te radiketim)*
*dilê min gav bi gav dipêçe*
*li ser çoka te bi teşiyê re her diherikim nava rîs*

*Ev çend hezar sal in tu dirêsî*
*mirinê li ser bejna min*
*ev sedsala çenda ye tu dirêsî derd û kulan ji jana min*
*ev çend demsal in tu dirêsî zilmê li ser rîşa min*

*Te bi çavekî ez xwarim tu têr ne bûyî*
*te bi du çavan ez vexwarim dîsa tu têr ne bûyî*
*te bi çavên nava dilê xwe li min mêze kir te ez ne dîtim*
*ez baskşikestiyê evînê bûm*
*û li ba ewrên azadiyê difiriyam*
*ez di nava her du rîsên ku te li hev dipêça de dipelişîm*
*û diheliyam*
*Îcar ez li te digeriyam*
*min dûrbîn dida ber çavên xwe lê min te ne didît*
*bêtir tu dûr diketî ji min*
*min cil li xwe dikir ji pola*
*min sol dixist piyê xwe ji hesin û ez dibeziyam ber bi te ve*
*lê ji giraniya rêsiyê te ne difilitîm*
*ji ber ku teşiya te diloriya tîna wê ya germ min dişewitand*
*ne dibeziyam*
*ez heliyam*
*ez herikîm*
*Min xwe zirav kir zirav kir zirav kir ji mû ziravtir*
*di nava tayên porê te re min xwe berda nava te*
*ku ji nû ve şîn bibim bêm dinyayê*
*Min xwe dirêj kir dirêj kir dirêj kir di nava temenê xwe û te de pirê çêkir*
*ji bo ku ji cem xwe bigehîjim cem te*
*Min xwe hûr kir piço piço parî parî bela kir li ser rûyê te*
*Min xwe şewitand sor kir sor kir sor kir*
*û alaviya xwe gehiştande te*
*ji bo ku ez xwe li ber tîna te germ bikim*
*Min xwe şewitand ez bi te germ bûm*

*Birêse diya min*
*tava zilmê îro mêjiyê min dikelîne*
*canê min dişewitîne*
*bêhn li min teng dike*
*min dibetilîne*

*Birêse diya min*
*ez xwe didim bin siya piyariya te*
*dixwazim li wir bêhna xwe bidim*
*rawestim û amade bim*
*xwe nefiroşim bistînim*
*(xwe bistînim bê firotin)*

*Birêse diya min*
*ez xwe davêjim bextê te*
*dîsa ji min re bibe star*
*stara heyîna min*
*stara giyana min*
*stara zayîna gewherê min*
*...*
*...*

**Azad ZAL**



rizoxerzi@gmail.com
Rizoyê XERZÎ

# Xwedê xêr bike

Piştî hevdîtina Serokomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul bi hevserokê DTP'ê Ahmet Turk re û gotinên Gul yên der barê pisgirêka kurd de, hin hêvî û sinyalên ji bo pêvajoyeke nû bi gelek kesan re çêbû. Lê eger we ya rast divê; bi qasî serê derziyê ew gotinên Gul hêvî bi min re çênekirin. Tu yê bêjî çima?

Ji ber ku tê bîra me tevan Serokwezîr Erdogan jî berî 4-5 salan gotibû pisgirêka kurd heye û pisgirêka min e jî lê di pratîkê de êrîşên li ser kurdan ji her demê zêdetir bûn.

Madem ku pêvajoyeke nû dest pê dike çima ewqas siyasetmedarên kurd ên partiya DTP'ê ku bi fermî siyasetê dikirin hatin girtin û di zindanê de ne.

Piştî vê daxuyaniya Gul bi rojekê bi dehan balefirên şer ên artêşa tirk ji Amedê rabûn û berê xwe dan çiyayên kurdan.

Piştî vê daxuyaniyê bi rojekê Wezîrê Dewletê Cemîl Çîçek daxuyaniyeke gelekî balkêş da. Piştî ku qetliama li Şemrexa Mêrdînê pêk hat û di encamê de 44 kes hatin kuştin, DTP daxwaza hilanîna sîstema cerdevaniyê kir û guftûgoya li ser xirabiyên vê sîstemê hinekî cihê xwe di rojevê de gitin. Lê daxuyaniyeke ecêb di vê derbarê de ji alî Cîgirê Serokwezîr, Cemîl Çîçek ve hat. Çîçek got ku madem DTP vê daxwazê dike ew yek bi serê xwe sedem e ji bo ku ev daxwaz pêk neyê. Yanî madem ku DTP dibêje bila sîstema cerdevaniyê hilê, divê em wê sîstemê berdewam bikin.

Berî demekê jî piştî hilbijartinên 29'ê adara 2009'an û piştî ku DTP'ê şaredariya Îdirê bi dest xist, dîsa Çîçek gotibû: Haya we ji talûkeya DTP'ê hebe wa ye bûn cîranê Ermenistanê.

Mixabin dema mirov bala xwe dide wan gotinên Gul bi xwe jî, ku dibêje: Dixwazin bêjin pisgirêka terorê, dixwazin bêjin pisgirêka Başûrê rojhilat, dixwazin bêjin pisgirêka kurd, navê wê çi dibe bila bibe ev pisgirêka sereke ya Tirkiyê ye. Yanî li vir jî baş tê xuyakirin ku hê nav li wê pisgirêkê nekirine û xwedê xêr bike gelo çi plan bi dû vê daxuyaniyê de hene. Her ku berpirsiyarên dewletê tiştekî wiha dibêjin piştre tiştekî xirab diqewime.

Pisgirêka kurd bi daxuyanî an jî gotinekê nayê çareserkirin, ev rastiyek e û derketiye holê ku bi dehê salan e ev mijar bi şer, tundî û inkarê nayê çareserkir. AKP jî baş dizane ku mijara herî sereke ya ku hikûmetên berî wê tune kirin, bêçareserkirina pisgirêka kurd e, lewre jî dem hatiye ku ji bilî şer û tundiyê çareseriyeke din bê dîtin. Ji bo ku dawî li vê hikûmetê jî neyê dixwazin çareseriyekê li gorî xwe peyda bikin. Gelê kurd û tevgera kurd amade ye ji bo çaresiya demokratîk û aştiyane û xwedî proje ye lê li aliyê din hê di nava gelek dudiliyan de ye û dixwaze vê pisgirêkê qet nebe bi dana hindiktirîn mafên kurdan çareser bike.

HAWARA EYSO


ROJA DAYIKAN




XÊRA WÎ JI MELAYÎKETAN RE JÎ NEMA




BÊ ŞÎROVE




DAXUYANIYA ÇÎÇEK




## Qerf û Henek

### Dehşikê ji bavo re bîne

Mirovekî barê xwe li kerê kir û berê xwe da aş. Giha gundekî, yekî gundî jê re got tu ji Xwedê natirsî te barê vê kerê giran kiriye û tu jî lê siwar bûyî. Lawik li xwe nexweş anî û rabû bi xencerê kera xwe kuşt û got ma qey merva te ye, ew kera min e, ya te çi ye. Vegeriya malê û mesela xwe ji bavê xwe re gor. Bavê wî xwe jê bêtir aciz kir û got ka kurê min here dahşika wê kerê bîne ez jî dahşika wê bikujim û êdî bila ew bê bavê han qebûl neke. Îca ev jî mesela Cemîl Çîçek û DTP'ê ye.

www.arsivakurdi.org


# Resimên 'masumiyet'ê

Sê hêmanên girîng di teknîka resima William Blake de balê dikişînin. Neyartiya otorîteyê, reva ji îmajên derrastiyê û mezinkirina azweriyê hema bêje di bingeha hemû xebatên Blake de cih digire

**AHMET ATAŞ -** LONDON / ANF

Resimên orjînal ên helbestkarê îngilîz ê navdar, resam û vîzyonerê mîstîk William Blake piştî du sedsalan li Londonê bi pêşangeheke ji gel re vekirî ji bo hunerhezan hate pêşandan. Pêşangeha ku li Tate Britain hate vekirin û heta 4'ê mijdarê dê vekirî be, cih dide xebatên Blake yên jiyana wî.

Tate Britain malovaniyê ji resimên William Blake re dike. Piştî 200 salan cara yekem bi awayekî berfireh berhemên Blake ji bo hunerhezan tê nîşandan. 16 resimên Blake di pêşangehê de cih digirin.



**Hostayê kehaneta romantîk**

Cara yekem berhemên Blake ku weke hostayê kehaneta romantîk tê qebûlkirin di sala 1809'an de li Londonê li dikana birayê wî hatiye pêşandan. Ji wê rojê heta îro ev berhem nehatine pêşandan. Lê niha li Tate Britainê ji bo hunerhezan tê pêşandan.

**Di tevgerên şoreşger de cih girt**

Blake, di jiyana xwe ya hunerî de di warê resim û edebiyatê de dûrî hunermendên elît sekiniye û di nava tevgerên şoreşger ên wê demê de cih girtiye. Resam di xebatên xwe yên destpêkê de bi masumiyeta mirovên bêşens re ne bextewariya ku bi jiyana bajarvanî û modern a bêedaletiyê bi zimanekî wêneyî diteyisîne ser tuvalan. Sê hêmanên girîng di teknîka resim ya Blake de balê dikişîne. Neyartiya otorîteyê, reva ji îmajên derrastiyê û mezinkirina azweriyê hema bêje bingeha hemû xebatên Blake ye.

**Berhemên Yewnana Antîk**

Blake, li Londonê di zarokatiya xwe de li şûna fîgurê rasteqîn ên jiyanê berhemên yewnana antîk kopî kiriye û xêzên Raphael, Michelangelo, Marteen Heemskerk û Albercht Durer di emrê xwe yê biçûk de keşf kiribû.

Ji ber nerazîbûna wî ya li hemberî olên bûne sazûmankar û her cureyên nepenîtiya ku pêkutiyên li ser mirovan dinixumîne, li hemberî nepenîtiya modern ku ber bi lihevkirinê diçe serî rakiriye. Blake, dibêji di koka şoreşê de lîbîdo heye û çavkaniya şoreşê ji vê lîbîdoyê ye.

William Blake di 28'ê mijdara 1757'an de li Londonê hate dinê û di 12'ê tebaxa 1827'an de li Londonê çû ser dilovaniya xwe.

# Xelatên 'Azadiya Ramanê ya Zarakolu' hatin dayîn

"Xelatên Azadiya Ramanê" ku ji bo avakara Weşanên Belge Ayşenur Zarakolu têne dayîn, gihîştin xwediyên xwe.

Xelatên Azadiya Ramanê bi merasîmekê li Şaxa ÎHD'ê ya Stenbolê hatin dayîn. Merasîm bi sînevîzyona ku behsa jiyana Ayşenur Zarakolu dikir hate vekirin. Axaftina vekirinê ji aliyê Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Stenbolê Gulseren Yolerî ve hate kirin. Yolerî, got ku têkoşîna xwişka Ayşe dida ji bo azadiya mirovan bû û her tim ji bo bifikirin, bikevin nava tevgerê û bixin nava tevgerê peyam dida wan.

Parlamenterê kevin ê DEP'ê Mahmut Alinak layiqî xelata azadiya ramanê hate dîtin. Alinak, xelata xwe ji destê nivîskar Cezmî Ersoz girt. Alinak, dema xelata xwe wergirt axaftineke kurt kir û got: "Ez vê xelatê ji bo gelên qedîm ên li Kurdistan û Tirkiyeyê werdigirim."

Piştî Alinak Koordînatora Weşana Giştî ya Radyoya Ozgurê Fusûn Erdogan ji ber ku niha girtî ye li ser navê wê xebatkara Radyoya Ozgurê Muharrem Demircioglu wergirt. Her wiha nivîskar Temel Demirer jî xelata xwe ji rêveberê ÎHD'ê Umît Efe wergirt. **STENBOL / DÎHA**





## 'Em hene' li NÇM'ê hat pêşkêşkirin

Koma şanoyê Teatra Bakur ku di bin banê Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) de xebatên xwe dimeşîne ji lîstikên xwe yên beşa jinê lîstika bi kurdî "Em hene" pêşkêş kir. Jinan eleqeyeke germ nîşanî lîstika ku li salona şanoyê ya NÇM'ê hate lîstin, da. Rûgeş Kirici, Dîlber Koceroglu û Rojbîn Elban di vê lîstikê de dilîzin. Lîstika "Em hene" şîdeta li hemberî jinê û neçartiya jinê ya di nava jiyana civakî de radixîne berçavan. **STENBOL**



## Lîstika 'Qedexe' li Gimgimê hat pêşkêşkirin

Koma Şanoyê ya Nûnertiya Egîtîm Senê ya Gimgimê bi navê 'Yasaklar-Qedexe' lîstikek pêşkêş kir.

Koma Şanoyê ya Nûnertiya Egîtîm Senê ya Gimgimê lîstika bi navê 'Yasaklar-Qedexe' li Navenda Çanda Gimgimê pêşkêş kir. Şaredara Gimgimê Gulşen Deger, Serokê Rêxistina DTP'ê ya Gimgimê Abdulbasît Taş, endamên Egîtîm Senê û gelek welatiyan bi eleqeyeke mezin temaşe kir. Sekreterê Nûnertiya Egîtîm Sena Gimgimê Yusuf Demîr diyar kir ku Egîtîm Sen ligel ku sendîkayeke kedê ye di heman demê ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê jî têdikoşe. Piştî axaftinê şano bi eleqeyeke germ hate temaşekirin. **MUŞ / DÎHA**

## Ji YODER'ê kermes û pêşangeha wêneyan

Ji hêla Komeleya Xwendekarên Zanîngeha Yuzuncu Yilê ya Wanê (YODER) ve, di bin navê 4'êmîn Şahiyên Biharê yên Alternatîf ên Kevneşopî de, li Kuçeya Hunerê kermes û pêşengeha wêneyan hate vekirin.

Pêşangeha wêneyan, ji wêneyên ji hêla girtiyên siyasî yên Girtîgeha Tîpa F a Semsûrê ve hatine çêkirin û kermes jî ji xebatên destan ên ji hêla xwendekaran ve hatine çêkirin û xwarinên herêmî pêk tên. Ji endamên YODER'ê Şahîn Yaşar, der barê mijarê de got ku wan li hemberî çalakiyên dejenere û naveroka wê pûç ên rêveberên zanîngehê ve tê lidarxistin, wek YODER'ê şahiyên alternatîf li dar xistine. **WAN**





**Peyvên Nepenî**

Kakşar Oremar
kakshar_oremar@yahoo.de

## "Caş belaş"ên me!

"Caş belaş" navê helbesteke mamosta Hejar Mukriyanî ye ku di çaxê şoreşa Îlonê (1961-1975) de hatiye nivîsandin. Hingî komek ji endamên komîteya navendiya KDP'ê ku serkêşiya wan Îbrahîm Ehmed û Celal Talabanî dikir, ji nava refên şoreşgerên kurd derketin û xwe teslîmî rejîma Iraqê ya wê demê kirin. Duberekî kete nava kurdên ku heya hingî bi yêk hêz û yêk deng ji bo standina mafên xwe yên neteweyî û diyarkirina qedera xwe siyasî bi hemû awayan şer û xebat dikirin. Ew kom ji sala 1966'an û pêde ketin xizmeta Baasiyên cinayetkar ku kuştina kurdan ji wan re weke ferzekî îlahî bû. Gelek kes di wê baweriyê de bûn ku ev duberekî yê dawî bi şoreşa başûrê Kurdistanê bîne, lê piraniya kurdan ji gotina nemir Mistefa Barzanî derneketin. Çimkî êdî ew di nava kurdan de xwedî kesayetiyek efsaneyî bû ku ji hemû kurdên Kurdistanê re wek semboleke şoreşgeriyê û bi qasî pêxemberekî dihate hezkirin. Wî bi tedbîr û siyaseta xwe hemû planên her du dewletên Îran û Iraqê pûç derxistin û caşên 66'ê her carê ketin xizmeta dewleteke dagîrker û cehşatiya xwe bi meaşekî kêm didomandin. Lê cihê daxbariyê di vir de ye ku hingî bi hezaran pêşmerge û şoreşgerên kurd bi destê wan cehşan hatin kuştin. Bi awayekî ku ew şerên di navbera her du aliyan de qewimîn, ger li dijî hikûmeta navendiya Iraqê bihatana kirin, qedera şoreşê yê ber bi aliyekî din ve çûba. Helbet li pey xiyaneta 1966'an artêşa Iraqê jî hinekî vehesî û mixabin karê wan cehşên xayîn bû sedem ku sala 1975'an şoreş bi awayekî trajîk di nîvê rê de bisekine.

Îcar a ecêb di vir de ye ku piştî têkçûna şoreşê, Baasî ketin nêçîra wan cehişkên xwefiroş ku salên dirêj di bin fermana wan de bûn û bûbûn guhdirêjên wan!

Li bakurê Kurdistanê berî çend rojan li gundekî kurdan li wilayeta Mêrdînê, cehşên cahil û bêqîmet dest bi cinayetekê kirin ku heta di dîroka cîhanê de jî kêmwêneye. Mixabin em kurd qet ji dîroka xwe îbret û dersan nagirin. Sedem jî ew e ku hafza me ya dîrokî zeîfe û zû tiştan ji bîr dikin. Li bakurê Kurdistanê sîstema kemalîzmê bi dehan sal in ku li dijî şoreşa Kurdistanê cehşikên xwe belaş û elaş diçerîne. Çima belaş? Ji ber ku ew cehşik ne bi kêrî kemalîstan hatin û ne jî sûdek ji vî karê xwe yê rûreşane dîtin. Ger em serkeftinên kurdan di hilbijartinên vê dawiyê de bi awayekî siyasî û baş binirxînin, hingî yê bêtir aşkera bibe ka ji wan re cehşikên xayîn li pêşberî şoreşa Kurdistanê çiqas bi bandor bûne. Li gorî min wan bi vê xiyaneta xwe ya dîrokî ne tenê karekî pozîtîf ji dewleta Tirkiyeyê re nekirin, belkî kurd û bi taybetî jî nifşê nû baştir ji xewa giran û nezantiyê şiyar kirin. Kemalîzm li ser bingeha faşîzma serdema Hîtler şên bûye. Ger kesek vê gotina min napejirîne li dîroka her du sîsteman binêrin ka kiryar û zagonên wan çiqas nêzî hev in û çawa heta roja îro jî parêzvanên sîstema kemalîstan li Tirkiyeyê mîna faşîstan li dijî kurdan tevgerê dikin.

Cinayeta ku vê carê bû sedema kuştina 44 kesan, di nava raya giştî û mirovhezan de xemeke giran çêkir, lê wek bav û kal dibêjin: **"her şerekî, xêrek jî li pey e."** Em dibînin ku piştî vê bûyerê hinek cehşên kurd çekên xwe danîn û di nava hikumetê de jî fikra rakirina sîstema cerdevantiyê ketiye rojeva karê siyasetmedarên tirk.

Piştî vê bûyerê gerek em kurd li hemû Kurdistan û cîhanê li dijî kurdên xwefiroş zibarê bidin dest pêkirin. Her kesê ku hinek xwedî şiûr û wijdan be, pêwîst e karekî wiha ji xwe re bike prensîbeke jiyanê û ji cehşan re bêje: "Bes e nebin palên pêşo û li ser hafrê dijimin neçirin…".

Li bakurê Kurdistanê êdî kurd xwedî hêzeke siyasî û mezinin. Di nava tirkên demokrat û antîdemokrat de xebateke berfirehtir pêwîst e. Bila AKP û generalên faşîst ew meaşê ku didin cehşkên xwe, bînin Kurdistanê û projên avedaniyê bi wê budca mezin zêdetir bikin. Ger ew sed salên din jî gotina Bulent Ecevit a ku der heqa pirsgirêka kurd de gotibû:**" Li welatê me pirsgirêka kurd tune, belkî pirsgirêka teror û paşkeftinên sosyal-civakî li rojhilatê Tirkiyeyê heye…"** dubare û bikine benîştê devê xwe, yê tu sûdekî ji vê siyaseta xwe negirin. Êdî pirsgirêka kurd wisa mezin bûye ku berçêla hikûmeta Tirkiyeyê jî girtiye. Ev doz ne mimkûn e û qet nayê berdan.










# Li qadan doza aştiyê kirin

## Roja Dayikan li herêmê bi awayek xemgînî bi daxuyanî, meş û çalakiyên cihê hate pîrozkirin. Dayikan balkişand li ser pevçûnên li Tirkiyeyê û xwestin ku bi riyên aştiyane pirsgirêka kurd bê çareserkirin

10'ê gulanê Roja Dayikan li herêmê bi daxuyanî, meş û çalakiyên cihê hate pêşwazîkirin. Li Amed, Wan, Stenbol, Elih, Sêrt û Agiriyê dayikan cilên reş li xwe kirin û meşeke bêdeng li dar xistin. Dayikan di daxuyaniya xwe de xwestin ku riya aştiyane ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd bê vekirin û êdî bila dilê dayikan neşewite.

**Ji bo wan rojeke reş e**

Endamên Însiyatîfa Dayikan a Amedê bi boneya Roja Dayikan li Qada Deriyê Çiyê hatin cem hev. Dayikên reş li xwe kirin, ber bi abîdeya Ugur Kaymaz ve dest bi meşa bêdeng kirin. Şaredara Baglarê Yuksel Baran, Şaredara Bismilê Cemîle Emînoglu û Şaredara Dêrikê Çaglar Demîrel jî beşdarî girseya Dayikan a zêdeyî hezar kesî bûn. Dayikan wêneyên zarokên ji hêla leşker û polîsan ve hatine kuştin hildan. Dayikên pankarta, "Îro rojeke reş e" vekirin, dowîzên, "Xelata min dayika min e", "Dest nedin zarokên me" û "Guh bidin dengê dayikan" hildan.

Li ber abîdeya Ugur Kaymaz li ser navê dayikan Aynur Yilmaz daxuyanî xwend. Yilmaz diyar kir ku ji ber kuştina zarokan îro ji bo dayikan rojeke reş e û wiha got: "Ji ber êşa em di encama kuştina zarokên xwe de dikişînin, îro em daketin qadan û hestên xwe tînin ziman. Îro dayikên hemû cîhanê bi coş vê rojê pîroz dikin. Lê li welatê me rewş cuda ye. Zarok tên kuştin, girtin û windakirin. Dayikên kurd vê rojê jî bi êş derbas dikin. Serê zarokên kurdan bi qontaxa çekan tê perçiqandin, di bin panzeran de tên pêpeskirin, tên kuştin, girtin û windakirin." Yilmaz balkişand ser zordariyên li ser DTP'ê jî û xwest ku dawî li zordariya li ser gelê kurd bê. Yilmaz biryara KCK'ê ya bêçalaktiyê ya heta 1'ê hezîranê bi bîr xist û ji dewletê xwest ji bo aştiyê berivê bide vê biryarê.

**Bila operasyon bi dawî bibin**

Komek endamên Însiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Wanê bi boneya Roja Dayikan li ber DTP'ê ya Bajar hatin cem hev. Dayikên pankarta, "Ev roj ji bo dayikan rojek tarî ye" û "Bila zarokên me nemirin" vekirin, dowîzên, "Dest nedin zarokên rojê", "Ne me çeteyan tune bikin", "Dawiyê li pergala cerdevaniyê bînin sivîl nekin kujer" hildan. Dayikên heta Parqa Musa Anter meşiyan wêneyên zarokên hatine kuştin hilgirtin. Dayikên piraniya wan kincên reş li xwe kirîn, ji xwendekarên YODER'ê yên li Kuçeya Hunerê kermes vekirîn û konvoya dahwetê ya di rê de derbas dibû jî piştgiriyek mezin girt.

Li parqa Musa Anter li ser navê dayikan Rukiye Urun daxuyanî da. Urun diyar kir ku li cîhanê Roja Dayikan bi coş tê pîrozkirin lê ew bi dilşikestî û xemgînî pêşwazî dikin. Urun wiha axivî: "Ev roj ji bo dilê dayikan xweş be tê pîrozkirin. Lê dilê Dayikên kurdan şikestiye. Ji ber ku zarokên me rastî îşkenceyê tên, ji girtin û kuştinê xilas nabin, serê wan bi qontaxên çekan tên pelçiqandin, bi panzeran tên pêpeskirin û bi salan di girtîgehan de tên girtin. Ugur Kaymaz 12 salî, Enes Ata 6 salî, Îsmaîl Erkek 8 salî, Fatîh Tekîn 3 salî, Mizgîn, Şîlan, Zîlan, Evîn,Nazlican, Nazar, Abdullah û bi sedan zarokên din tên qetilkirin." Urun xwest ku dawî li operasyonan bê û bersiva biryara bêçalaktiyê ya KCK'ê ya heta 1'ê hezîranê bê dayîn. **AMED- WAN**




*Dayikan li herêmê bi cilên reş meşa bêdeng li dar xist. Dayikan di çalakiyan de diyar kir ku Roja Dayikan pîroz nakin û vê rojê wekî rojeke reş dinirxînin.*

## 'Dest nedin pêşeroja me'

Însiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Stenbolê jî bi heman armancê li Qada Galatasarayê bi pankarta, "Îro rojeke reş e" daxuyanyek da çapemeniyê. Dayikan dowîzên, "Dest nedin zarokên rojê", "Zarokên me pêşeroja me ne dest nedin pêşeroja me" û "Kujerên zarokan kî ne?" hildan. Beşdaran wêneyên zarokên hatine kuştin jî hildan, sloganên, "Ne DTP'ê çekan bêdeng bikin" û "Îro rojek rej e" avêtin. Bi boneya Roja Dayikan zarokan bi tirkî û dayikan jî bi kurdî daxuyanî dan.

Li ser navê zarokan Jiyan Taşdemîra 11 salî daxuyanî xwend. Taşdemîr diyar kir ku ji dilê wan nayê îro kulîlkan bidin Dayikên xwe û wiha axivî: "Çima Dayik û zarokên wan tên kuştin? Vê ji me re bêjin êdî. Lazim e dengê me bê bihîstin. Em cîhanek di nav şer û çekan de naxwazin. Ji ber zarokên tên kuştin û nikarin gulan ji dayikên xwe re bibin, roja xwe li ser gora dayikên xwe derbas dikin, em vê rojê protesto dikin."

Behiye Duman jî ev tişt gotin: "Wekî Dayikên kurdan me jî dixwest em vê rojê bi coş pîroz bikin û zarokên me kulîlkan bidin me. Lê ji ber şerê berdewam dike, rewş cuda ye. Ji bo me ev roj rojek reş e. Ji ber ku zarokên me tên kuştin. Tên girtin, îşkence li wan tê kirin, desten wan tê şikandin û serê wan bi qontaxên çekan tên perçiqandin." **STENBOL**

## Zarok têne kuştin

Însiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Sertê bi minasebeta Roja Dayikan bi beşdarbûna bi sedan jinan daxuyaniyek da çapemeniyê. Jinên li ber avahiya DTP'ê hatin cem hev bi pankartên, "Bila operasyon bên rawestandin", "Bila edî dilê dayikan neşewite" û "Bila zarok neyên kuştin" heta kolana Guresê meşiyan.

Piştî meşê Endama Meclîsa Şaredariya Sertê Gulbahar Karataş daxuyanî xwend. Karataş diyar kir ku li hemû derên cihanê Roja Dayikan bi şahî û diyariyan tê pîrozkirin lê li herêmê rewş ne wiha ye. Karataş bal kişand ser zextên li hemberî zarokên kurd û wiha got: "Em dikarin bêjin ku roja dayikan ji bo me rojeke reş e. Zarokên me tên kuştin, tên girtin, îşkence li wan tê kirin, milê wan tê şikandin, serê wan bi qundaxên çekan ve tê parçekirin û di bin panzeran de tên pelçiqandin bi guleyan tên kuştin."

**Diyariya herî xweşik aştî ye**

Sekretera Jinan a Navenda Egîtîm Senê Gulçîn Îsper, diyar kir ku di Roja Dayikan de diyariya herî xweşik jiyaneke bi aştî û azadî ye. Îsper, destnîşan kir ku di serî de divê hurmetê nîşanî mafê jiyanê bidin û wiha got: "Zarok ji bo dayikan tiştên herî bi qiymet in. Li cîhanê û Tirkiyeyê xizanî, newekhevî û cudaxwaziya cinsiyetê bênavber didome. Li Tirkiyeyê li ser gel zext û zordarî bênavber didome. Di nava van şert û mercan de dayik naxwazin roja xwe pîroz bikin. Li Amed, Colemêrg, Êlih û Edeneyê li ser zarokan êrîşên hovane pêk tên. Dayik di nava îşkenceyan de vê rojê peşwazî dikin." Îsper, da zanîn ku ji bo dayikan diyariya herî xweşik û girîng çareseriya pirsgirêkê ye.

**Di roja xwe de rondik barandin**

Meclîsa Jinan a Bajar a Êlihê bi minasebeta Roja Dayikan şahiyek organîze kir. Şahiya dayikan li parka Ataturkê pêk hat. Dayikan bi cilên kurdewerî tevli şahiyê bûn. Dayikan di şahiyê de daxwazên xwe yên aştiyê anîn ziman. Dayikan xwestin ku dawî li şer bê û bila êdî dayik rondikan nebarînin. Her wiha li ser navê jinan endama Meclîsa Jinan a Bajar Narîn Erol daxuyaniyeke bi kurdî. Narîn Erol destnîşan kir ku li herêmê dayik roja xwe bi xemginî di nava rondikan de pêşwazî dikin Erol, da zanîn ku divê ew rewx biguhere. **SÊRT- ÊLIH - ENQERE**

## Li Bazîdê çalakiya dayikan

Li navçeya Bazîda Agiriyê jî bi çalakiyekê Roja Dayikan hate pêşwazîkirin. Li salona civînê ya Şaredariyê bi beşdariya Cîgirê Şaredar Ekrem Muftuoglu, serokê DTP'ê ya navçeyê Yusuf Sogut, Serokê TUHAYD-DER'ê Ahmet Ayak, aktîvîstên Însiyatîfa Dayikên Aştiyê û dayikên bazîdî pîrozbahî pêk hat.

Piştî rêzgirtina ji bo şehîdên demokrasiyê Cemîle Kaya, Fatma Acar û Makbule Onder wekî dayikên salê hatin daxuyandin û hatin xelatkirin. Serokê TUHAYD-DER'ê Ayak diyar kir ku dema rawestandina rondikên dayikan û êşa wan hatiye. Piştî axaftinan koma şano û muzîkê ya girêdayî Navenda Çanda Xanî-Derê xebatên amade kirîn, pêşkêş kirin. **AGÎRÎ**

## Mijara konseyê 'namûs' e

**STRASBOURG**

Komîsyona Wekheviyê ya Konseya Ewropayê dê di 14'ê gulanê de li Stenbolê civînekê bi mijara namûsê li dar bixe. Di komîsyonê de namûs dê bibe mijara sereke. Li gorî daneyên Neteweyên Yekbûyî li cîhanê salê 5 hezar kes bi navê namûsê tên qetilkirin. Her wiha li gorî îstatîstîkên Midûriyeta Mafên Mirovan a Buroya Serokweziriyê ya Tirkiyeyê her hefte li Stenbolê herî kêm kesek bi navê namûsê tê kuştin û di navbera salên 2003 û 2007'an de hezar û 100 kes bi hinceta namûsê hatine kuştin.

## Di şahiyê de li hev civiyan

**HATAY**

Platforma Jinan a Antakyayê şahiyek organîze kir û di şahiyê de stranên bi zimanê ermenî, kurdî, tirkî û erebî hatin gotin. Şahî li Navenda Çanda Hatayê pêk hat. Nivîskar û helbestvan Neşe Yaşîn û gelek jinên Antakyayê tevli şahiyê bûn. Seroka Platforma Jinan a Antakyayê Asuman Kavukoglu, diyar kir ku li Tirkiyeyê jin di nava şert û mercên newekhev de dijîn. Kavukoglu, destnîşan kir ku dema zext û şîdet tê berçavan giraniya pirsgirêka jinan bêtir derdikeve holê. Nivîskar û helbestvan Yaşîn jî bal kişand ser bandora şer a li ser jinan û got ku herî zêde jin di şer de zirarê dibînin. Yaşîn, daxuyand ku aştî bi destê jinê pêk tê.

## Şeva piştevaniyê hate lidarxistin

**STENBOL**

Platforma Jinên Stenbolê ya Piştevaniya Berxwedana DESA'yê ji bo piştgiriyê bide karkera berxwedêra DESA'yê Emîne Arslan şevek organîze kir. Şahî li lokala TMMOO'yê pêk hat. Di şahiyê de pankarta 'Îro kêf dikin, sibê jî di çalakiyê de ne' vekirin. Seroka platformê Zeynep Ozdal di axaftina xwe de bal kişand ser berxwedana karkerên DESA'yê û diyar kir ku ev 375 roj in li fabrîkaya Duzceyê û 310 roj in jî li maxazeya Sefakok a DESA'yê berxwedana karkeran destpê kiriye. Ozdal, da zanîn ku dê çalakiyên piştgiriyê bidomînin.

## Divê midûr Cerrah îstîfa bike

**STENBOL**

Kolektîfa Femînîstan li hemberî kuştina Munevver Karabuluta 18 salî çalakiya şermezar kirinê li dar xist. Femînistan di çalakiya xwe de daxuyaniya Midûrê Ewlehiyê yê Stenbolê şermezar kir. Femînîstan diyar kir ku li gorî Midûrê Ewlehiyê Celalettîn Cerrah heke malbat xwedî li keça xwe derketa ev bûyer pêk nedihat. Jinan destnîşan kir ku divê Midûr Cerrah îstîfa bike. Jin li Metroya Taksîmê civiyan û bal kişandin ser kuştina Karabulutê. Jinan da zanîn ew dewleteke ku di kuştina Karabulutê de malbata wê berpirsiyar dibîne naxwazin. Her wiha jinan daxuyand ku dewleta ku kujeran diparêze naxwazin.

## Şîr bo çerm û hestiyan baş e

**AMED**

Pisporan diyar kir ku rojê nîv lître şîr ji bo tenduristiya jinan pir baş e û divê bê vexwarin. Bi taybetî şîr ji bo çerm û hestiyan baş e. Asîtên rûn ên di nava şîr de çermê rûyê mirovan nerm dike zindî dihêle. Her wiha pisporan got heke kesên ji şîr hez nakin an jî nikarin vexwin li şûna şîr dikarin mast, penîr û dew jî bixwin.

www.arsivakurd.org

Hawar
11 Gulan 2009 Duşem

## Berçavkên sexte bi kar neynin

Pispor dibêjin ku berçavk ji aksesuarê zêdetir ji bo tenduristiya çavan girîng e. Lê li aliyê din pispor hişyar dikin û dibêjin ku divê mirov teqez berçavkên sexte bi kar neyne. Ji ber ku ev berçavk dibin sedama korbûnê. Pispor dibêjin ku berçavkên sexte di trafîkê de jî ji bo mirovan dibin xetere. Ji ber ku mirov nikare rngan baş ji hev derxîne. Ev yek jî dê bibe sedema qezayên trafîkê. **AMED**



# Hem derman e hem jî xwarin e





Li Kurdistanê û deverên ku berf dibare sping şîn dibe. Di tibê de weke derman jî tê bikaranîn. Lê ya herî girîng pispor dibêjin ku piştî zivistana dijwar û heliyana berfê destpêkirina nexweşiyên biharê sping digihe hawarê

Sping ji malbata beybûnan e. Di tibê de wek giha û derman di rêza duyem û sêyem de cih digire. Her wiha di latînî de pir cureyên wê hene. Lewre me di vê nivîsê deli ser du cureyên wê nivîsî.

Li ser spingê pir lêkolîn nehatine kirin. Lewre jî li gorî destkeftiyên xwe ez ê bidim nasîn.

Sping gihayeke biharî ye. Piştî berf dihele û baran dibare, di nav zeviyan de, li nav mêrgan û bedenan xwe bixwe ji erdê dipijiqe (şîn tê). Belgên wê zirav bi qasî 5-6 cm dirêj dibin.Temenê xwarina wê bi qasî mehekê ye. Di mehên tîrmeh û tebaxê de kulîlkên zer vedike. Bejna kulîlkên wê 5- 15 santîm bilind dibin. Şîrek ji qurm û pelê wê tê, ji wî şîrî benîşt tê çêkirin.

### Li her derê şîn dibe

Welatê wê nayê zanîn, lê li hemû welatên berf lê dibare hêşîn dibe. Dîroka wê jî, ji ber ku gihayeke pêşîn ê xwarinê ye û di hemû deveran de şîn tê, digihe demên destpêka mirovahiyê.

Şîrê gihayî, jahrkuj (antî gîft-pan jahr), hesin, pir cureyên proteînan, antîoksîdan û vîtamînên cur bi cur. Sping şîr zêde dike, hêrsbûnê dadixe. Ji bo nexweşiya satê pir bi fêde ye. Germahiya laş dadixe, jahrkuj e, îştahê vedike, kêmasiya vîtamînan dadigire, şekir dadixe, hezmê hêsan dike, sîstema givirandinê tekûz dike, têrker e û hwd.

### Pispor çi dibêjin?

Profesor Dr. Erdem Saracoglu der barê spingê de wiha dibêje: "Piştî zivistana dijwar dawî tê, zerzewat û fêkî kêm dibin. Piştî heliyana befrê û barîna baranê, destpêkirina nexweşiyên biharê û lewaziyên bedena mirovan, sping digihe hawarê. Dema sping 5-6 pel vedan, heke bê berhevkirin pir bi êde ye. Xwarina wê jî pir meqbûl e. Lê dema pelên spingê mezin dibin û kulîlkên wê vedibin, êdî hemû fêde û nirxên xwe winda dike.

Sping ji ber ku hesin tê de pir e, ji bo kêmasiyên vîtamînên beden û pêşîgirtina nexweşiyan xurekeke bê qisûr e.

Heke sping bi xavî bê xwarin an jî seleta wê bê çêkirin, îştahê vedike.


Heke xwarina wê bê çêkirin û bê patin, ji bo aşik (mexde) û rûvikan fêdedareke bê hempa ye. Li derveyî xwedîkeriyê, ji xebitîna hemû lebatan re dibe alîkar. Ji belg û reha wê şîrek tê, ew şîr derman e. Her wiha ji wî şîrî benîştek tê çêkirin. Li ser bêzên tifê, zihabûna dev û hêsankirina sîstama givirandinê bandoreke gelekî baş nîşan dide.

Profesor Dr. Ahmet Marankî jî der barê spingê de wiha dibêje: Di pel, kulîlk û reha spingê de bandora jahrkujiyê heye. Heke ava pelê wê ya rasteqîn li ser cihê mar pê ve de (gez bike) bê danîn, jahrê dikuje û winda dike. Ava spingê ji bo nexweşiyên agirîn tê bikaranîn.

### Jê şerbet jî tê çêkirin

Piştî paqijkirin û şûştinê, spingê bikin nav sîrkuteke mermerî an jî hewaneke mermerî (an jî conî), baş biherişînin (bikutin) heta ava wê derê û bikin tûrekî bila ava wê dawerive. An jî biguvêşin, ava wê jê derînin, wê avê hinek şekir tevlê bikin û bikelînin. Ku çend kelek hatinê, ji ser agir hilînin. Şerbeta we ya dermanî temam e. **AMED** ***(Ji lêkolîna Bavê Jîndar)***






## Cîhana sewalan mirovan matmayî dike

Der barê cîhana sewalan de gelek tiştên ku nayên zanîn hene. Mirov dema ku wan tiştan dibîhîze matmayî dibe.

Der barê cîhana sewalan de çend mînak: Kesên ku hêştirmeyan nas nakin, nizanin an jî nêdîtine tune ne. Lê gelo tê zanîn ku çavê hêştirmeyan ji mejiyê wan mezintir e.

Gelo hûn dizanin li cîhanê çûka ku herî bi lez difire kîjan e? Di encama lêkolînên cîhana sewalan de derketiye holê ku çûkên ku herî bi lezgînî difirin teyr in. Wisa bi lezginî difirin ku wesayîtên Ferrarî jî li paş xwe dihêlin. Tê gotin dema teyr ber bi jêr difirin leza wan di saetekê de dibe 322 km.



Li asîmanan çûka herî mezin albatros e. Dema difire dûrbûna di navbera baskên albatrosê de dibe 3 metre. Bi vê dîmena xwe albatros mirovan sermest dike.

Der barê moriyan de jî agahiyên balkêş hene. Weke ku tê zanîn morî bi jîrbûnê tên naskirin. Tê gotin ku di koloniyekê de nîv milyon morî hene. Moriyên ciwan li yên biçûk dinêrin û berpirsyarên wan in. Moriyên mezin jî xwarinê tînin koloniyê. Moriya dayik jî tenê hêkan dike. Pêywira wê jî ev e.

Her wiha der barê perperîkan de jî gelek tişt tên gotin. Temenê hin perperikan tenê rojek e. Di rojekê de gelek tiştan dijîn. Lê agahiyên der barê wan de tenê ne ev in. Tê gotin ku perperîk bi lingên xwe tehmê digirin.

Ji cîhana sewalan agahiyeke din a balkêş jî der barê kuliyan de ye. Gelo hûn dizanin guhê wan li kû derê ye? Lê heke hûn meraq bikin û rojekê bixwazin guhên kuliyan bibînin li serê wan nenêrin. Ji ber ku guhên kuliyan di çongên wan de ne. **AMED**

## Fîlmên tirkan bandoreke neyînî dikin

Fîlmên biyanî û bi taybetî jî yên tirkî, bandoreke neyînî li ser şêwazê lixwekirina cil û bergên ciwanên başûrî dike.

Nazlî Kamiran, ku bi berdewamî temaşeyî fîlmên tirkî dike, wiha dibêje: "Dema ku ez temaşeyî xelekên dramayên tirkî dikim, bala xwe didim dîzayn û rêxistina rengên wan. Ez ewqas bala xwe nadime naveroka fîlman. Ji bo wê da ku rêxistina rengan ji bîra min neçe, demildest serdana bazara cilan dikim."

Cilfiroş jî dibêjin ku ciwan her mehê 3-4 modelan diguherin. Xwediyê Kogeha Busenes Clas Herêm Saîd ji bo firotina cilên zilaman, 8 sal in li bazara Hewlêrê kar dike. Ew dibêje ku piştî dûblajkirina fîlmên tirkî di kanalên erebî de, niha piraniya ciwanên Hewlêrê berê xwe dane modelên tirkî û di hilbijartina dizaynan de çav li aktoran dikin. Saîd dibêje ku, guherîna modalan ku li cem ciwanên Hewlêrê heye li tu bajarekî din yê Kurdistanê nîn e. Saîd wiha got :

"Ew cil û bergên ku reklamên wan di televîzyonan de derkikevin, gelek zû digîjin Kurdistanê. Her modeleke nû ku em tînin, piştî du rojan kevn dibe, çunkî modelên nû tên bazarê."

Beşek ji xwediyên dikanên cilan diyar dikin ku bi sedema guherîna modelan gelek car ziyan digîje wan. Lewre ji ber derketina modelên nû, ew neçar dibin modelên kevn erzan bikin.

Aram Hesen ku li bazara Nîştîman xwediyê dikanekê ye dibêje, piraniya ciwanan li ser modelên tirkî, di mehekî de 4 heta 5 modelan diguherin. Ji ber guherîna modelan jî, gelek caran cilfiroş zirarê dikin.

Her wiha di nava civakê de jî ev mijar dibe sedema nerazîbûnan. Beşek ji zilamên bi temen, bi aşkerayî gotinan ji ciwanan re dibêjin û wan wek keçan dibînin. Hecî Behram Hemedê 54 salî, dibêje lixwekirina cil û bergên modayê sîmayên zilamtiyê li cem kuran nehiştiye. **HEWLÊR**

## Turnuva diyarî Apê Musa kirin

Turnuvaya Futbolê ya Egîtîm Sena Wanê ku ev 5 sal in tê lidarxistin îsal diyarî nivîskar û rojnamegerê kurd Apê Musa hate kirin.

Egîtîm Sena Wanê ev 5 sal in turnuvaya futbolê li dar dixe. Turnuvaya îsal diyarî Apê Musa ku di encama cinayeta kiryar nediyar de hatibû qetilkirin hate kirin. Turnuvayê li qada xalîçe ya Altayliyê ji bo bîranîna Apê Musa û şehîdên demorkasiyê bi rêzgirtinê dest pê kir.

Di vekirina turnuvayê de Sekreterê Egîtîm Senê yê Wanê Sînan Gunduz axivî û got ku taybetiya herî girîng a futbolê aştî û biratî ye. Gunduz wiha axivî: "Ji bo ku piştgiriyê bidin aştî, biratî û hevkariyê me jî turunuvaya xwe ya îsal li ser navê Apê Musa li dar xist."

Gunduz got ku ev turnuva ji bo naskirina hev girîng e û ji ber vê yekê jî ji kesên ku turnuva organîze kirine re spas kir. **WAN**

www.arsivakurd.org